

K.T
ZANÎNGEHA YÛZÛNCÛ YÎLÊ
ENSTÎTUYA ZIMANÊN ZINDÎ
ŞAXA MAKEZANÎSTA ZIMAN Û ÇANDA KURDÎ



TEZA LÎSANS A BİLİND

DI HELBESTÊN MELAYÊ BATEYÎ DA BINYADA HIZR
Û RÛXSARÊ

Hayder Mohammed OTHMAN

14950001045

WAN - 2016

**K.T.
ZANÎNGEHA YÛZÛNCÛ YÎLÊ
ENSTÎTUYA ZIMANÊN ZINDÎ
ŞAXA MAKEZANÎSTA ZIMAN Û ÇANDA KURDÎ**



TEZA LÎSANS A BİLİND

**DI HELBESTÊN MELAYÊ BATEYÎ DA BİNYADA HIZR
Û RÛXSARÊ**

**Amadekar
Hayder Mohammed OTHMAN
14950001045**

**Şewirmend
Doç.Dr. Vecihi SÖNMEZ**

WAN – 2016

KURTE

DI HELBESTÊN MELAYÊ BATEYÎ DA BINYADA HIZR Û RÛXSARÊ

Bateyî şexsiyeteke naskirî ye di wêjeya kurdî ya klasîk de. Di heman demê de zanayekî mezin ê îslamê û welî ye. Li gundê Colemêrgê yê bi navê Bate hatiye dinê û bi navê gundê xwe tê nasîn. Di dîroka wêjeya kurdî de xwediyê yekem mewlûda nivîskî ye. Ev mewlûd hê jî di nav gelê bakurê Kurdistanê de dema şahî, qendîl û rojên pîroz ev mewlûda Bateyî tê xwendin.

Bateyî xwedî dîwaneke helbestan a kifşe nîn e, lê bi dehan helbestên xweşik nivîsîne ku di nav gel de bi awayekî jiberkirî tên zanîn. Hin helbestên wî jî ji hêla dengbêj û stranbêjan ve tên xwendin.

Her çiqas gelek lêkolîner û nivîskarên ku têkildarî wêjeya kurdî ne derbarê Bateyî nivîsîbin jî, xebatên wan bi jînenîgariya wî, bi hatin û çûna wî ya li dinê û bi berhevkirina çend helbestên wî sînorkirî mane. Heya niha derbarê helbestên wî xebateke zanistî nehate kirin. Bi tenê Zafer İlhan li ser mewlûda Melayê Bateyî xebateke zanistî pêk aniye û sala 2014 an pêşkêşî Zanîngeha Artuklulyê ya li Mêrdînê kiriye. Gelek pirsên têkildarî kesayeta wî, têkildarî teşe û naveroka helbestên wî bê bersiv mane. Bingeh û asoya fikrî ya Melayê Bateyî çi ye? Çavkaniyên helbestên wî kîjan in? Bandora Dîn, Quran, Siyer-î Nebî û Dibistanên Tesewifê li ser fikr û helbestên Bateyî çi ne? Di helbestên xwe de kîjan pîvan û kêş bi kar anîne? Zimanê wî yê wêjeyî çawa ye? Çima xwîner ewqas pê heyirî ne? Di parastina peyvên kurdî yên resen de xizmeta wî çawa çêbûye? Ew pirs tev bi salan in li benda bersivên xwe ne.

Ji lewre, em di vê lêkolîna xwe de bersivê didin wan pirsan. Di heman demê de em li ser teşeya helbestî ya helbestên Bateyî sekinîn û me mînakên wan dan. Di beşeke din a lêkolînê de jî bi awayekî dûr û dirêj jî li ser hunera rewanbêjiyê hatiye sekinîn, bi mînakên ji helbestan hatiye şîrovekirin.

Ji ber ku Bateyî helbestvanekî wêjeya klasîk a kurdî ye, di helbestên xwe de gelek caran peyvên erebî, farsî û tirkî bi kar anîne. Lewma me di qisma dawî ya

xebatê de cih daye ferhengekê û wateya peyvvan şirove kiriye da ku alîkariyê bide fêmkirina helbestên Melayê Bateyî.

Nîşe: Di pêşgotina lêkolînê de têgehên wek: Melayê Batê, Binyad, Hizr, û Teşe, hatine ravekirin.

Peyvên Sereke: Melayê Batê, Mewlûd, Naqşîfî, transkrîpsiyon, edebiyata Kurdî ya klasîk



ÖZET

MELAYÊ BATÊ'NİN ŞİİRLERİNDEKİ FİKİR VE BİÇİM YAPISI

Melayê Batê klasik Kürt edebiyatında tanınmış bir kişiliktir. Aynı zamanda büyük bir İslam alimi ve veli bir zattir. Hakkari ilinin Batê köyünde dünyaya gelmiş, köyünün adıyla tanınır. Kürt edebiyatı tarihinde, eskiden beri yazıla gelen ilk Mevlidin sahibidir. Bu Mevlid hâlâ da Kürt halkı arasında Mevrit kandilleri, sevinçli zamanlarında, mutluluk veya şükür gerektirecek merasimlerde de okunmaktadır.

Bâte belli bir şiir divanına sahip değil, ama onlarca güzel şiir yazmıştır ki; şimdiye kadar halk tarafından ezberle günümüze kadar gelmiştir. Şiirlerinin bir kısmı ise kasidevan, ilahi sanatçısı ve dengbejlerce tarafından seslendirilir.

Kürt edebiyat tarihiyle ilgilenen bir çok yazar ve araştırmacı Melayê Batê hakkında yazmışlarsa da çalışmaları onun biyografisi, nasıl dünyaya gelip çıkması, birkaç şiirini toplamakta sınırlı kalmıştır. Şimdiye kadar şiirleriyle ilgi akademik bir çalışma yapılmamıştır. Sadece Zafer İlhan, Melayê Batê'Nin Mevlidi üzerinde ilmi araştırma yapmış, 2014 yılında Mardin Artuklu Üniversitesi Kürt Dili ve Edebiyatı bölümüne sunulmuştur.

Onun kişiliği, şiirlerinin içerik ve şekli hakkında birçok soruya yanıt verilmemiştir. Melayê Batê'nin düşünce ufuk ve temeli nedir? Şiirlerinin kaynakları hangileridir? İslam, Kuran, Sıyer-i Nebi ve Tasvuf'un, Bâtê'nin düşünce ve şiirleri üzerindeki etkileri ne kadardır? Şiirlerinde hangi ölçü ve uyakları kullanmıştır? Kullandığı edebiyat dili nasıldır? Okuyucularını bu kadar kendisine hayran bırakmasının sebepleri nelerdir? Asıl Kürtçe kelime ve deyimlerini korumada Kürt dili ve edebiyatına ne biçim hizmetler vermiştir? Bütün bu sorular yıllardır yanıtlarını beklemektedir.

Bu yüzden biz bu araştırmamızda, tüm bu sorulara cevap veriyoruz. Bununla birlikte Batê'nin şiirlerindeki şiir şekli üzerinde duulmuş, örneklerle anlatmıştır. Araştırmanın başka bir bölümünde ise; Belagat sanatı üzerinde uzun uzun durulmuş, şiir örnekleri ile açıklanmıştır.

Batê klasik Kùrt edebiyatının önemli ve büyük bir şairi olduğundan; Kùrtçenin yanısıra şiirlerinde sık sık Arapça, Farsça ve Türkçe sözcükler de kullanmıştır.Yani kendi asrında Ahmedi Hanî ve birçok Kùrt şair ve edebiyatçısında olduğu gibi üç-dört dil kullanmıştır.Bu yüzden araştırmanın son kısmına Lügatçe eklemiş, sözcük anlamlarını açıklamıştır ki Melayê Batê'nin şiirlerinin anlaşılmasına yardım sağlansın.

Not: Araştırmanın önsözünde yapı, fikir, biçim ve Melayê Batê sözcükleri açıklanmıştır.

Anahtar Kelimeler: Melayê Bate, Mevlid, Nakşilik, transkripsyon, klasik Kùrt edebiyatı

SUMMARY

THE STRUCTURE OF FORM AND IDEA IN MELAYÊ BATÊ'S POEMS

Batê is a famous figure in kurdisch classical literature. At the same time he is a great scholar of islam and a saint as well. He was born in the village of Batê of Hakkâri province, and he is known with the same name. He is the owner of the first written mewlid in kurdisch literature. This mewlid is still being read among kurdisch living in the north part of kurdistan.

Batê has not got a certain divan of poems, but he wrote many beautiful poems which are known by heart among people. Some of his poems are being sang by singers and dengbêj.

Many writers and researchers who are interested in the history of kurdisch literature have written about Melayê Batê, but their studies are restricted to his biography, his life and death, and they have collected only some of his poems. Until now there is not a scientific study about his poetry. Only Zafer İlhan did a scientific study on Melayê Batê's mewlid, and presented it to the Mardin Artuklu University in 2014. But a lot of questions about his personality, about form and content of his poems were not answered. What was the base and scope of Melayê Batê's ideas? What were the sources of his poems? How were the impacts of religion, the Koran, siyer-i Nebi and schools of mysticism on his ideas and poems? Which rhyme and meters did he use in his poems? How was his language of literature? Why do his readers admire him? In what way did he contribute to using original kurdisch words? All these questions remain intact.

For this reason, in our study we are trying to give answers to these questions. At the same time we focused on the poetical form of Batê's poems, and we gave examples of these. In another section of the study we put emphasis on the art of rhetoric and tried to explain it with examples from poems.

As Batê is a classical poet of kurdisch; he often uses words from Arabic, Persian and Turkish languages. For this reason we added a dictionary in the final section in order to make Melayê Batê's poems more understandable to the readers.

P.S: In the preface of this study key words such as: Texture, Idea, Form and Melayê Batê, were defined.

Key Words: Melayê Batê, Mewlud, Naqşî Path, transcription, classic literature of Kurdish



NAVEROK

KURTE	II
ÖZET	IV
SUMMARY	VI
NAVEROK	VIII
PÊŞGOTIN	XI
KURTEBÊJE	XIII
DESTPÊK	1
1. MELAYÊ BATEYÎ JIYAN Ê BERHEMÊN WÎ	1
1.1. Nav û Dîroka ji Dayikbûna Wî	1
1.2. Xwendina Wî	3
1.3. Malbat û Zewaca Wî	4
1.4. Mexlesên Wî	5
1.5. Berhemên Wî.....	7
2. WATEYA PEYVA “BINYAD” Ê	9
3. WATEYA PEYVA “HIZR” Ê	10
4. WATEYA PEYVA RÛXSAR (ŞIKIL) Ê	11
BEŞA YEKEM	
JI ALIYÊ HIZRÎ VE HELBESTÊN MELAYÊ BATEYÎ	12
1. DÎ RAMAN Ê HIZRÊN BATEYÎ DE QURANA PÎROZ	12
1.1. Bikaranîna Ayet û Biwêjên Quranê	12
1.2. Bikaranîna Peyvên Quranê	14
1.3. Amajeyên Qiseyên Quranê	15
1.4. Bikaranîna Wateya Ayetan	16
1.5. Navên Quranê Di Nav Helbestên Bateyî da.....	17
2. XWEDÊNASÎ LI CEM BATEYÎ	18
2.1. Nav û Sîfetên Xweda	18
2.2. Nasîna Xweda	20
2.3. Erk û Perweriyên Mirovan Li Hember Xweda.....	25

3. JI ALIYÊ BATEYÎ VE KESAYETIYA PÊXEMBER	27
3.1. Bateyî û Dîtina Wî ya Pêxember a di Xew da	32
3.2. Nav û Paşnavên Pêxember.....	35
3.3. Îsra û Mî'rac û Şefa'et di Nav Helbestên Bateyî da.....	37
4. TÊKELIYÊ BATEYÎ BI TESEWIFÊ RE	42
4.1. Di Helbestên Bateyî de Edebiyata Tesewifê	43
4.2. Di Helbestên Bateyî de Remz û Babetên Tesewifê	44
4.2.1. Tebî'et (Sirûşt)	45
4.2.2. Evîn (Îşq)	45
4.2.3. Mey.....	48
4.2.4. Zulf	48
4.2.5. Dinya	50
BEŞA DUYEM	
JI ALIYÊ RÛXSARÊ VE HELBESTÊN MELAYÊ BATEYÎ	52
1. ZIMANÊ HELBESTÊ	52
1.1. Peyvên Kurdî Yên Resen.....	52
1.2. Bandora Erebî	54
1.3. Bandora Farisî	57
1.4. Bandora Tirkî.....	59
1.5. Peyv li Aliyê Wateyî ve.....	59
1.6 Navên Cih , Welat û Mîlletan.....	63
2 . WÊNEYÊN ŞI'RÎ	65
3. KÊŞA HELBESTÊN BATEYÎ	71
4 . SERWA Ê CUREYÊN WÊ	77
4.1. Li Gorî Cihê Wê di Risteyê da	77
4.2. Li Gorî Hevbeşiya Denga Cureyên Serwayê.....	79
4.3. Paşserwa (Redîf)	81
BEŞA SÊYEM	
HUNERÊN EDEBÎ	84
1. CIWANKARÎ (ELBEDÎ')	84
1.1. Ciwankariya Hunerên Têkildarê Peyvan.....	84

1.1.1. Hevregezî (Cinas)	84
1.1.2. Pirtkirin – Kertkirin(Tesmît)	85
1.1.3. Vegêrandin	86
1.1.4. Înandin -Wênanewe	86
1.1.5. Dubarekirin-Patkirdinewe(Tekrîr).....	87
1.1.6. Jêgir - Lêwergirtin (Îqtîbas).....	87
1.1.7. Tesrîh.	88
1.1.8. Paşserwa (Redîf).....	88
1.1.9. Rengîn – Têrziman (Mulemme')	89
1.1.10. Teradûf (Hemwateyî).....	89
1.2 .Ciwankariya Hunerên Têkelderê Wateyê	90
1.2.1. Dijberî – Dijyek (Tezad)	90
1.2.2. Cê Gorîn ('Ekis).....	90
1.2.3. Xweşbehane - Ciwanî Bayis (Husn-u Talîl).....	91
1.2.4. Jinezanînvehatin -Ragomkî Aşkera (Tecahulî 'Arî).....	91
1.2.5. Bîranîn -Têlnîşan (Telmîh).....	92
1.2.6. Pêwendî –Komkirin(Tenasûb).....	93
1.2.7. Fîşalekirin (Mubalexe).	93
1.2.8. Şirovekirin (Tefsîr)	93
1.2.9. Pend Bêjî (Îrsal el Emsil).....	94
1.2.10. Pirs û Bersiv ('Tercî' fil Mihawere)	95
1.2.11. Roçûn (Îtra)	96
1.2.12. Lomeyê Xwekirin.....	96
1.2.13. Poşîn (Tewriye)	96
2. WATENASÎ :	97
2.1. Îstifham	97
2.2. Gazîkirin (Nîda).....	98
2.3. Ragihandin	98
2.4. Fermanî (El Nehî)	99
ENCAM	100
ÇAVKANÎ	101
PÊVEK	103
FERHENGA HELBESTÊ	104

PÊŞGOTIN

Edebiyata Klasîka Kurdî mîna deryayeka berfirh e ku tijî guher û mirwariyên giranbiha ne. Her kesê ku di wê riyê de dimeşe, tiştên nû û taze bi dest dixê . Ji ber vê yekê jî edebiyata Klasîka Kurdî di hemî deman de pêwîstî bi xebat û lêkolînê heye. Melayê Bateyî mîna gewhereka di nav wê deryayê de ye. Herveha navê wî di nav civeta Kurda û Edebiyata Kurdî de wekî sitêrkeka geş diyar e. Em jî di vê xebata xwe da li ser helbestên helbestvanê hêja yê ku di Edebiyata Kurdî ya Klasîk da û di nav hemû Kurdan da bi berhema xwe ya ku bi navê Mewlûdê tê naskirin û li ser nivîskarê vê yê navdar Melayê Bateyî rawestiyane. Xebata me bi piranî li ser mijarên hizr û rûxsarê ye, me di xebata xwe de helbestên Melayê Bateyî ji aliyê van her du mijaran ve şîrove kirine.

Mebesta vê tezê " Di helbestên Melayê Bateyî da Binyada hizr û rûxsarê " ew e ku heta niho çî vekolîneke akademîk derbarê şîrovekirin û hilsengandina helbestên Bateyî da nehatiye amadekirin, dîsa weke pêdivî hemî layenên helbesta wî nehatîne şîrovekirin. Tenê li ser berhema wî ya bi navê Mewlûda Kurmancî, vekolîneka akademîk li Unîversîteya Artuklu ya Mêrdînê ji aliyê Ziver İlhan ve hatiye xebitandin. Ji ber vê armancê ev e bûye xaleka giring ku ev vekolîn bi rengekî berfireh bihête encamdan.

Ev xebat ji despêk û sê beşan pêk hatiye: Di despêkê de, em li ser hemû qonaxên jiyana Melayê Bateyî sekinîne. Me cih daye cihê jidayîkbûna wî û herwiha em li ser perwerde û xwendina wî jî rawestiyane. Digel vê me payvên "binyad" û "hizr" û "ruxsar"ê jî şîrove kirine. Beşa yekemîn derheqê hizr û ramanê wî ye. Me behsa Quran, Xweda, Pêxember û Tesewifê jî kiriye ku bandor li ser hizr û ramanê wî kiriye ku ji bo nivîsandina helbestan. Di beşa duyemîn de metn ji aliyê şiklî ve hatiye vekolîn. Di vê beşê de em li ser "ziman", "kêş", "qafiyê" û "wêneyên şî'rî" yê jî rawestiyane. Di beşa sêyemîn de bi piranî em li ser hunerên edebî di nav helbestên wî de rawestiyane.

Ji bo encamdana vê vekolînê û gehiştin bi xalên dest nîşankirî yê vekolînê ya pêdivî bû ji aliyê tîyorî û piraktîkî ve ku bihête diyarkirin, lê me pitir sûd ji rêbaza şîrovekariyê wergirtiye. Çimkî bitenê nîşandana babetî têgehiştina tewaw nagehîne û cihê amajekirinê ye ku ji bo karê piraktîkî bi xwe deqên şî'rî şîrove kiriye. Bo mînak û deqên şî'rî jî me pirtûka M. Xalid Sadîni ya bi navê "Mela Huseynê Bateyî Helbest û

Berhemên Wî" bi layê Weşanxaneyê Nûbiharê di sala 2013an da çap bûye , esas girtiye.

Nahê veşartin ku di cêbecêkirina vê xebatê da gelek asteng hene. Girngtirîn astengên di rêya van curê vekolînan de, kêmbûna jêderk û çavkaniyan, bêguman amadekirina xebateka wiha ne hêsa bû. Lewra li ber destê me tu xebateke bi vî awayî rêkûpêk tunebû. Dîsa jî ew jêder û çavkaniyên ku me bikaranîne û mifa jê hatiye wergirtin. Piraniya wan bi tîpên "Erebî" bûne, tezê me jî bi tîpên "latînî" ye, ji ber wê yekê tîpên latînî astengeka din bû di riya me de.

Jî di amadekirina vê tezê de şîret û asankariyên şewirmendê min Doç. Dr. Vecihî SONMEZ û serok beşê min Doçentê alîkar Nesim SÖNMEZ arîkariya wan cihê rêzê ne. Her wiha ji bo ku di warê metodolojî û serastkirinê de alîkariya min kir ji hevalê min ê lekolînêr Mamosta Ahmed ÖNER ra ji gelek spas dikim.

Herî dawî, ez spasiya hevser, malbat, xwuşîk û birayên xwe jî dikim.

Pişî van hemû pêngavan, encamên vekolerê bi rengekî kurt û puxt bi çend xalan hatîne rêzkirin. Hêvîdar im ev vekolîn bibîte rêxoşkirnek bo karên mezintir û berfirehtir.

Hayder M. Othman

Wan -2016

KURTEBÊJE

- amd : Amadekar
B : Berg
Bnr : Binêre
Ç : Çap
H : Teqwîma Hîcrî
b.n.b : berhema nav borî
H.r : Heman rûpel
Hwd : Her wekî din
J : Jimar
S : Sehîfe
C : Cild
P.X : Pirtûka Xalid Sadînî
Ko : Kovar
M : Teqwîma Mîladî
Nd : Nivîskarên din
R : Rûper
S.x.l : Silava Xwedê Lê be
Wer : Werger
Weş : Weşanger/Weşanxane

DESTPÊK

1.MELAYÊ BATEYÎ JIYAN Û BERHEMÊN WÎ

1.1. Nav û Dîroka ji Dayikbûna Wî

Navê wî Mela Huseynê Bateyî, kurê Sofî Mistefa ye. Melayê Bateyî ji gundê Bateyê ye ku ev gund dikeve rojhilatê Elkê (Beytuşşebabê) ye.¹ Li gorî hinek lêkolînerên weke Marûf Xeznedar² û Sadiq Bahaeddîn³ Bateyî ji 'eşîra Ertûşiyana e. Lê Melayê Bateyî, ne ji 'eşîra Ertûşiyana e. Lewra devoka gundê Batê û ya Ertûşiyana ne weke hev e û mirovên wî gundî xwe ji vê 'eşîrê nahesibînin.⁴ Derheqê navê Melayê Bateyî de li gor lêkolînera nêrînê cuda cuda hene. Hinek ji wan wek Mela Mehmûdê Bazîdî, Jaba, Mîcir Son, Belec Şîrkû, Celadet Bedirxan, Emîn Zekî Beg, Elaeddîn Seccadî û Qenatê Kurdo dibêjin navê wî “Ehmed” e.⁵ Li gorî Dr. Marif Xeznedar, Dr. Abdurrahman Adak, Babê Zêrevanî, Xalid Sadînî, Tehsîn Doskî, Sadiq Bahaeddîn, Huseyin Şemerxî navê wî Mela Huseynê Bateyî ye, ji ber hebûne hinek delîlan.

1. Li ser “Hemaîl” a wî bi xwe ya ku neviyên keça wî Zulfê, parastine -ku niha li cem Mela Hecî Mihemedê Şembî ye- wisa hatiye nivîsandin: Sahîbûhû we malîkûhû Huseyîn bîn Mustefa.

2.Mela Dirbaz, neviyê Mela Huseyn e û li ser “Hemaîl” a ku li cem Mela Cemîl Axayê Giravî ye wisa nivîsiye: “Sewwedehû Mela Dirbaz bin Mela Tahir bin Huseyn.”⁶

3. Li devera Hekarî û Behdînan ku navê Melayê Bateyî Mela Huseyîn e û heta demekê ne yê dur jî gelek kesan ji pîrosiyana bi vê navê siwînd di xwar⁷.

¹ Abdurrahman Adak, *Destpêka Edebiyata Kurdî ya Klasîk*, Weşanên Nûbihar, Çapa Yekemîn, Stenbol 2013, r. 245.

² Marûf Xeznedar, *Mêjûy Edebî Kurdî*, Weşanên Aras, Erbil 2010, r.379.

³ Sadiq Bahaeddîn Amêdî, *Hozanvanê Kurd*, Weş. Korî Zanyariy Iraq, Bexdad 1980, r. 91.

⁴ M. Xalid Sadînî, *Mela Huseynê Bateyî Jiyana, Helbest û Berhemên Wî*, Weş. Nûbihar, Çapa Sêyem, Stenbol 2013, r.36.

⁵ Adak, *b.n.b.*, r. 273.

⁶ Sadînî, *b.n.b.*, r. 21.

⁷ Tehsîn İbrahim Doskî, *Melayê Bateyî Jiyana û Berhem*, Çapa Duyem, Dihok 2005, r. 17.

Li ser dîroka ji dayikbûna wî dîtinên lêkolîneran ji êkdu cuda ne. Li gorî hin lêkolînerên wekî Sadiq Behaeddin Amêdî, Qanadê Kurdo, Muhemmed Emîn Zekî, Bazil Nikitin, Minorsky û Elaeddîn Seccadî ew di sala 1414 an di 1417an da hatiye dinyayê û di 1491an an jî di 1495an de wefat kiriye. Li gorî hin lêkolînerên wekî Marûf Xeznedar, Feqî Huseyîn Sağniç, Amir Assanpour û Ebdurreqîb Yûsif, ew di sedsala XVII⁸an de hatiye dinyayê û di sedsala XVIII⁹ an de çûye ber dilovaniya Xwedê.¹⁰ Koma yekem behsa çî delîlan nakin, ji ber çend delîlên jêrîn nêrînên koma duyem rastir e.

1. Ji ber ku di helbesta bi navê “Bi dil îro Xedengim ez” da bêjeya “tiveng”ê bikar aniye:

Du Eslanan wereng hatin

*Bi Tabûr û **Tiveng** hatin*

Bi Şimşîr û xedeng hatin

Qîrên îna Musilmanan (p.x, r. 129)

Bateyî behsa tabûr di destê wan de jî tiveng dike, lêbelê tiveng piştî salên 1550î li Londonê îcad bûye, ew jî tê vê wateyê ku Melayê Bateyî piştî salên 1650 yên mîladî hatiye dinyayê.¹¹

2. Di helbesteka danberheva Bateyî û Mela Mensûrê Girgaşî da jî Bateyî gotiye:

Ji şeklê Âdem û Nûhî

Çi bêjim husnê teqwîmê

" Nefextu fihî mîn rûhî "

Be'îd e bête tefhîmê (p.x, r. 154)

⁸ Sedsala 17an

⁹ Sedsala 18an

¹⁰ Ziver İlhan, *Mewlûda Melayê Bateyî*, Teza Lîsansa Bilind Zanîngeha Mardin Artukluyê Enstîtuya Zimanên Zindî yên Tirkiyeyê, Mêrdîn 2013, r.6.

¹¹ Sadînî, b.n.b., r. 27.

Li gorî nêrîna Sadînî, eger ku di risteya “*Nefextu fihî mîn rûhî, min ruhê xwe pif kirê de “Nefextu”*” li gorî hesabê ebcêd bê hesibandin sala 1717 derdikeve holê:

$N,F,X,T: 50(N)+ 80(F)+ 400(X)+ 600(T) =1130$ H ye. Ew jî 1717ê mîladî dike¹²

3. Tê gotin ku Yehya Begê kurê Êzdînşêr ratib (me'aş) daye Bateyî. Bi rastî jî di dema şerê Osmaniyan û Safewiyan de mîrekî Hekarî bi navê Yehya Beg hebûye û ev şer jî di tarîxa 1730-1747 an de qewimiye.¹³

4. Eger Melayê Bateyî berî Ehmedê Xanî (1650-1707) bijiya, Ehmedê Xanî yê di Mem û Zîna xwe da behsa Melayê Bateyî bikira. Ji ber vê yekê jî derdikeve holê ku Bateyî ne berî Xanî jiyaye.¹⁴

5. Delîlek din jî ev e ku di nusxeya “*Hemal*”a li Gundê Batê de serdema nivîsîna berhemê aşkere kiriye û em ji wir dixwînin ku ev berhem di serdema Îbrahîmxanê Hekariyê de hatiye nivîsandin. Têzanîn ku Îbrahîmxan di navbera salên 1700-1742 hikum kiriye.¹⁵

6. Mala Mela Mihemed û Mala Temerê Brahîmê Bateyî, her du binemala nivşên Bateyî ne, bi neh piştan xwe dibene ser Melayê Bateyî, li gor van bavikan eger her bavek 30-40 salan ji kurê xwe mezintir be, divê mela Huseynê Bateyî heta sala 1760î jiya be, ew jî eger 75 salî miribe divê 1680 hatibe dinyayê.¹⁶

Wekî encam eger van argumana tevan li ber çavan bigrin, dikarîn bêjîn ku Bateyî di dawiya sedsala hivdehemîn hatiya dinyayê û heta bi nîvê serdema duyem ji sedsala hijdehemîn jiyaye. Tarîxa ku Merûf Xeznedar ji bo jiyana Melayê Bateyî dibêje ku 1675-1760 ev tarîxa herî nezîkî rastiyê ye.¹⁷

1.2. Xwendina Wî

Melayê Bateyî ji nav kilasîkên Kurmancî da helbestkarê mîna yên herî dîndar e, malbata wî bi giştî dîndar û ji çîna ruhban e. Bavê wî Mistefa Sofî ye û bi

¹² Sadînî, *b.n.b.*, r . 29.

¹³ Adak, *b.n.b.*, r. 272 .

¹⁴ Adak, *b.n.b.*, r. 272 .

¹⁵ İlhan, *b.n.b.*, r.7 .

¹⁶ Sadînî, *b.n.b.*, r. 30.

¹⁷ Xeznedar, *b.n.b.*, r.379.

awayekî xurt girêdayî dînê Îslamê ye, herwiha birayê wî Ehmed jî mela ye,¹⁸ Bateyî wek melayekî "duwazdeh 'îlmî" bi îcaze bûye. Li Miksê di medresa " Mîr Hesenê Welî" de xwendiyê.¹⁹ Mela Huseynê Bateyî pêşiyê li cem birayê xwe Mela Ehmed dest bi xwendinê kiriye. Piştî bûye panzdeh salî li medreseya Mîr Zeynel Begê Hekkarî xwendina xwe domandiye. Ji berhemên wî hatiye fêmkirin ku wî ji xeynî Kurdî, Farisî, Erebi û Tirkiya Osmanî jî dizanîbû. Li gorî peyv, têgeh û biwêjên ku di helbestên xwe de bi kar aniye, diyar e ku ew di edebîyat, dîrok, belaxet, hedîs, tewsîr, fiqih û kelamê de mahîr bûye. Melayê Bateyî piştî xilaskirina xwendinê li gundê Pîrosa nêzî Bate dest bi melatîyê kiriye.²⁰

1.3. Malbat û Zewaca Wî

Melayê Bateyî li gundê Pîrosa bi xanimeka bi navê Hemayil re zewiciye²¹ . Bateyî bi zewicîna xwe û xanima xwe wisa kêfxuş bûye ku helbesta " *Ji bextê min reşî rabû* " ku 16 çarînin ji bo evîndara xwe nivîsiye.

Ji bextê min reşî rabû

Xitala min ne batil hat

Li min roja xem awa bû

*Siyehzulfê miqabil hat*²²

Melayê Bateyî kurek û du keçên wî hebûye. Tahir, Zulfê, Asmîn. Mela Dirbaz kurê mela Tahir li ser hemahîlka bapîrê xwe, sewwedehû Mela Dirbaz bîn Mela Tahir bîn mela Huseyîn, nivîsî ye. Melayê Bateyî bi taybetî navên keçên xwe di helbestên xwe de nivîsîne.

Wekî dibêje:

Aşqê zilfa reş im

Aşiqê şeydayê Zilf

¹⁸ Rênas Jiyan, *Melayê Bateyî-Mawlûd û Hemû Helbestên Wî*, Ç. Yekem, Diyarbekîr 2013, r. 7.

¹⁹ Sadîni, *b.n.b.*, r. 32 .

²⁰ İlhan, *b.n.b.*,r. 8 .

²¹ Adak, *b.n.b.*,r. 274 .

²² Sadîni, *b.n.b.*,r. 32 .

Bê bade lew serxweş im

Serxweş û sewdaye Zilf (p.x, r. 113)

Dîsa helbest ji bo Asmîna keça xwe gotiye:

Bi zêrîn û toq û xilxalan

Meşa selwa me ebdalan

Xwihê avête alalan

*Şepala taze Asmîne*²³

Kurê Bateyî Mela Tahir jî xwediyê du kuran bûye, Mela Huseyn û mela Dirbaz. Herwîha tê gotin ku Bateyî di pêncî saliya xwe de helbesta "*sûbh û êvarî şeva tarî şemala kê yî tu*" li ser xanima xwe Hemaîlê gotiğe.²⁴

Sûbh û êvarî şeva tarî şemala kê yî tu

Leyletul qedr û berat in nûra mala kê yî tu

Çîçeka Baxê Êrem soxî bala bejn û bala kî yî tu

Bo Xwedê key bêje min kanê sepala kî yî tu

Dêm ketîbe zulf û hasê serhê xala kî yî tu (p.x, r. 102)

Bateyî qesta welatê Hîcazê kiriye ji bo kirine hecê, eve dê hindê gehênit ku ew mirovekê dewlemend bûye.²⁵ Lewra metrûkên Bateyî 250 salan piştî wî jî têra çend malan dikin.²⁶

1.4. Mexlasên Wî

Nasnavên ku em ji berhemên wî dizanin ew in. Bateyî, Melayê Bateyî, Feqîrê Bateyî, Bateyê Jar, Batey û Batê ne. Lê bi piranî li dawiyê hemî helbestên wî

²³ Sadîni, *b.n.b.*, r. 34 .

²⁴ Sadîni, *b.n.b.*, r. 34 .

²⁵ Doskî, , *b.n.b.*, r. 21 .

²⁶ Sadîni, *b.n.b.*, r. 34 .

de helbestvaniya wî Batey ye. Peyva Bateyî wekî mexles bi kar aniye, Bateyî forma nîsbetê ya gundê wî ye, navê gundê wî Bate ye, Bateyî jî bi wateye ew kesê ku ji gundê Batê yê ye.²⁷

Mînak:

Av û xwîn barîn peyapey

*Daîma bedhal e **Batey***

Saîl im rehmê fîza key

Mam di nav qewmê xerîb (p.x, r. 70)

Çi gul bû ew çi bilbil bû

Mired û metleba dil bû

Eger çî ew ji min sil bû

*Ji bo **Batê** Hemail hat (p.x, r. 110)*

Di helbesta " *Ji çiriya paşî pêda* " li dumahî dibêje:

Ji çiriya paşî pêda

Melayê Bateyî kanê

Sefer kêşa bi Muksê da

Li ser wextê Zivistanê (p.x, r. 124)

Di dawîya Mewlûdê xwe da mexlesa xwe wîha bi karaniye.

Bo cemî'ê mumînînê salihe

*Bo **Feqîrê Bateyî** elfatihe²⁸*

²⁷ Adak, *b.n.b.*, r. 276.

²⁸ Huseyn Şemrexî, *Mewlûd-Melayê Bateyî*, Weş. Nûbihar, Ç. Sêyem, Stenbol 2014, r. 68.

Helbestvan di vê beyta jêrîn da mexlesa xwe wekî “ Bateyî Jar” bi kar aniye.

Tu bi navê xwe yî Rehman

Tu bi heq sih cuzyê Quran

Bateyê Jar tu bi Xufran

Tu Xeffarê Xeta yî (p.x, r. 55)

Li dumahî helbesta " *Aşqê Zulfâ reş im* " da dibêje:

Rahet û sebr û selam

Tu yî çapik û xweşxeram

Gorî te me ez xulam

Bateyî qul şay e Zulf (p.x, r. 115)

Ji bilî nasnavên wî li xwe kirine, di berêkana wî û Mela Mensûrê Girgaşî de jî Mela Mensûr dibêje:

Selama min seher xêzî

*Li te ey Batê **Hekkarî***

Ji şehbazan şekerrêzî

Ji 'uqda durr û mirwarî (p.x, r. 152)

1.5. Berhemên Wî

1.5.1. Mewlûd

Di edebiyata Kurdî ya Kilasîk da Mewlûdnameya yekem ev berhem e. Gelek nusxe û çapên wê hene. Bi zîmanê Kurdî hatiye nivîsandin. Ji aliyê terkîban di bin

bandora Erebi, ji aliyê sernivîsan da jî di bin bandora Farisî da ma ye. Manzûm e û di şiklê mesnewiyê de hatiye nivîsandin.²⁹

1.5.2. Zembîlfiroş

Berhema duyem ya Melayê Bateyî Zembîlfiroş e. Zembîlfiroş a ku Qanadê Kurdo dibêje ya Melayê Bateyî ye. Lê delîlek weke mexlesê me peyde nekir ku em bibêjin ev berhem ji aliyê Bateyî ve hatiye nivîsandin.³⁰

1.5.3. Hemaîl

Berhema sêyem ya Bateyî “*Hemaîl*” e. Hemaîl, hê latînîze nebûye û nehatiye çapkirin. Bi tîpen Erebi hatiye nivîsandin. Di derkenarên wê de bê kîjan beş di derheqê çî de ye bi Kurdî hatiye nivîsandin. Di hin beşan de bi Farisî jî hevokin hene.³¹

1.5.4. Helbestên Wî

Helbestên Melayê Bateyî, ji aliyê wî ve nehatine komkirin. Helbestên wî di destxetên curbecûr de hatine qeytkirin. Ev helbestên wî, beriya niha di hin kitêbên Dîrokî û Kovaran da jî çap bûne. Hin lêkolîner jî ev helbest dane ser hev û ew çap kirine. Helbestên wî 7 heb jê munacaat, 6 heb jê ne’et, 16 heb jî helbestên curbecûr in.³²

²⁹ İlhan, *b.n.b.*, r.10 .

³⁰ İlhan, *b.n.b.*, r.16 .

³¹ İlhan, *b.n.b.*, r.11 .

³² İlhan, *b.n.b.*, r. 14 .

2. WATEYA PEYVA “BINYAD” Ê

2.1. Peyva Binyad

Di zimanê Îngilîzî de peyva “binyad” beramberî peyva “Structure” hatiye ku binereta wî jî peyva latînî ya “Struere” hatiye dariştin.³³ Peyva “binyad” di nav Kurdan da li destpêkêve pitir di biwarê bînasazî de hatiye, bi wateya ew rêya ku avahiyek pê dihête avakirin dihêt³⁴ di vê barê de di nav Ferhengên Kurdî da hatiye.

Di Ferhenga Hermanî da peyva “Binyat” wekî: Binaxe, bineret, paye û bîna hatiye ‘emîlandîn.³⁵ Lê di Ferhenga Xal da, ew peyv wekî: Binaxe û binyat, hatiye.³⁶ Careka din di Ferhenga Mehabad de ramana: Binaxe danan û xanû dirust kirdin, digeyine.³⁷ Di zimanê Farisî de dîsa peyva Binyad bi ramana Reg û Rîşe û Bineçe û Binaxe hatiye. Di Ferhenga hejîr ku Ferhengeka "Farisî – Kurdî" ye, peyva Binyad wekî: Binyat, Nawend, Damezrawe, Binaxe, Bneret, Binçîne, hatye. herweha peyva binyadgir bi ramana westaye xanû, Telarsaz, hatiye.³⁸ Di zimanê 'Erebî de peyva “Binyad” wekî zaraveka serbixwe nehatiye, lê belê di Qur'ana pîroz de bi: Elbîna, Benî, Mebnî hatiye ku ramana çêkirin li xwe digire.³⁹

Bi wê şewê dibînin ku zaraveya zimanewanî Binyad li Zimanên Ewropî û Farisî û Kurdî, hemî li hevdu nêzikin û peywendî bi binaxe danan û avahî çêkirin heye.

2.2. Pênaseya Peyva " Binyad"ê

Zêdebarî bilav bûna zaravê Binyat di nav rexneya edebîya hevçerixda lê bi awayiyekê roşin çemkê evê zaravê nehatiye diyar kirin, çunke ew xudan hebûneka cêgîr nîne û li duyv raw boçunên nivêskar û rexnegran dihête guhrîn. Binyatê hunerî di helbestê de diyar nabit heta vekolîn di navbera regezên pêkhênerên hozanê de

³³ Selah Fazil, *Nezeriyet-ul el-Bennayîye fî el-Neqd el-Edebî*, Bexdad 1987, r. 175.

³⁴ Se'd Farûq Yûsuf, *Binyatî Hûnerî le Şî'rekanî Ehmed Mûxtar Caf da, Teza Lîsansa Bilind*, Kolîja Perwerde yê Zankoya Selahedîn, Hewlêr 2011, r. 5.

³⁵ 'Elî Nanewa Zade, *Ferhenga Herman*, B. Yekem, Weş. Wezareta Perwerdê, Hewlêr 2005, r. 321.

³⁶ Şêx Muhammedî Xal, *Ferhenga Xal*, B. Yekem, Ç. Yekem, Weş. Kamran, Silêmanî 1960, r. 13.

³⁷ Gîwî Mukiryani, *Ferhenga Mehabad*, Weş. Kurdistan, Hewlêr 1962, r. 98.

³⁸ Hejîr 'Ebdulle Pûr, *Ferhenga Hejîr (Farisî – Kurdî)*, Ç. Yekem, B. Yekem, Weş. Xanî, Dihok, r. 229.

³⁹ 'Elî Tahir Huseyn, *Rexney Bunyadgerî li Tiyorî ji bo Piraktîzekirin*, Teza Doktorayê, Zankoya Silêmanî, Silêmanî 2007, r. 7.

nehête kirin, çî ev regez girêdayî layenê Rûxsarê (şikil) bin yan jî grêdayî naverokî bin, çünke ev regez serbexo nînin, belkî bi awayyekê hunerî pêkve hatîne grêdan, pêdiviyê peywendîya di navbera Rûxsar û Naverok bête diyarkirin, çünkî her êk ji wan temamerê yê dîye û em neşêyîn jêk cûda bikin.⁴⁰

Destnîşan kirina pênasayeka temam bo Binyat karekî bi sanahî nîne, çünke gelek raw boçûnên ciyawaz ji layê rexnegran derbarê pênasaya binyatî hatîne danan, lê bi rengekê giştî ji bo diyarî kirina pênasaya binyatî dê raw boçûnên hinek Nivîskar û Rexnegran wergirin, êkem kes ku behsa zaraveyê binyad kiriye di Zansitên mirovîni de "Lîvi Şîtratws" e nivîserê pirtuka Entropolojîyay Bunyadgerî.⁴¹ Nvîserek derbarê Binyad dibêjî: Bunyad peyveka kevin û resene û xudan hebûneka şrovekrîneye, nuke digel zanistên cuda cuda yê civakîda dête bikaranîn.⁴² Her li dor pênasê Binyatê hindê vekoler dibêjin: Binyat wênê tiştî ye, ew yasayê ewa pêkhîneyê wê şrove diket.⁴³ Liyonard caksun dibêje: Binyat komeka parçên pêkve grêdaye.⁴⁴ dîsa amajeka dî derbarê nasîna Binyad dibêjin Binyatê Hozanê amajeya ji bo peywendîya parçeka Hozanê digel parçeyên din.⁴⁵ Jan Piya Jê derheqê peyva Binyad dibêje: Binyad komeka gorankariye ku yasayê taybet bi xwe hene, wan jî bixwe êk sistemin.⁴⁶

3. WATEYA PEYVA "HIZR" Ê

Peyva "hizrê" peyveka navdêr e. Digel ve peyve, lekera kirinê pêkve bibe ev peyva dibe lêkereka hevedudanî wek "hizrîkirin" tê bikaranîn. Di nav ferhengên Kurdî da ev peyv bi wateya "fikir", "bîr", "yad", "raman" hatiye 'emîlandîn. Di ferhenga Kurdistanî da, peyva hizr wekî "bîr", "yad", "raman" hatiye şîrovekirin.⁴⁷

⁴⁰ Mirşîd Zibêdî, *Bîna-ul Qesidet-ul Fenî fî el-Neqîd el-'Erbî el-Qedîm vel- Mi'asir*, Dar-ul Şûn El-Seqafe el-'Ame, Bexdad 1994, r. 17.

⁴¹ Mariyo Laflîs, "Çemkî Binyad le Zanistên Civakî", (W. Sitar Batî Kerîm), *Kovara Raman*, J.113, Hewlêr 2006, r. 135.

⁴² Sankara Rafîndiran, *el-Bunyewîye el-Tefkîkiye*, (W. Xalîde Hamid), En-Naşîr Dar-ul Şûn el-Seqafe el-'Ame, Bexdad 1987, r. 15.

⁴³ Muhammed 'Ezam, *Tehlîl Xîtab el-Edebî 'ela Dew el-Mînahac el-Neqdiye*, Îtîhad Kuttab el-'Ereb, Dimeşq 2003, r. 32.

⁴⁴ Liyûnard Caksun, *Bos el-Bunyewîye el-Edeb val-Nezeriye el-Bunyewîye*, (W. Sayr Dîb), En-Naşîr Wezaret el-Seqafe, Dimeşq 2001, r. 44.

⁴⁵ Îbin Reşîq, *el'Umde*, C. 1, el-Qahîre 1955, r. 261.

⁴⁶ Fuad Reşîd, *Bunyadgerî le Roşînbîrî û Rexney Edebî Kurdî da*, Ç.Yekem, Weş. Arabxa, Bilawkirawekanî Yekêti Nûseranî Kurd, Kerkûk 2007, r. 11.

⁴⁷ Gîwî Mukiryânî, *Ferhenga Kurdistan*, Ç. Yekem, Weş. Aras, Hewlêr 1999, r. 927.

Lê di ferhenga Qazî da jî ew peyv wekî “fikir” hatiye şîrovekîrîn.⁴⁸ Herwiha ew peyv di ferhenga Şiwan de wekî “hîzir”, “hijr”, “bîr”, “fikir”, “yad” hatiye nivîsîn.⁴⁹ Dîsa di ferhenga Kanî bi wateya “bîr” da hatiye rêzkîrîn.⁵⁰

4. WATEYA PEYVA “RÛXSAR” Ê

Di nav ferhengên Kurdî da bi wejeya ruxsarê wateya “rû”, “şêwe”, “çare”, “dêm”, “dem û çaw” hatiye şîrovekirin. Di bi warê edebî da bi wateya “şikil” yan jî “rûyêt derva” hatiye ‘emîlandîn. Di ferhenga Xal da peyva Rûxsar wekî “dem û çaw” hatiye şîrovekirin.⁵¹ Lê di ferhenga Kurdistan da ew peyv weke “rû”, “şêwe”, “çare”, “dêm” hatiye ‘emîlandîn.⁵²

⁴⁸ Hafîz Qazî, *Ferhenga Qazî*, Ç. Duyem, Weş. Sipîrêz, Dihok 2005, r. 208.

⁴⁹ Şewket Mela Îsma'îl, *Ferhenga Şiwan*, Weş. Wezareta Perwerde. Hewlêr 2007. r. 910.

⁵⁰ Muhemmed Salih Pêndiroyî, *Ferhenga Kanî*, Ç. Yekem, Weş. Sipîrêz, Dihok 2010, r. 543.

⁵¹ Şêx Muhmmedî Xal, *b.n.b.*, r. 82.

⁵² Mukiryani, *b.n.b.*, r. 503.

BEŞA YEKEM

JI ALIYÊ HIZRÎ VE HELBESTÊN MELAYÊ BATEYÎ

Ji bo ku em binyada hizrên Bateyî derbixin, dibe ku em gelek layenên helbestên wî şirove bikin, ku bandor li ser hizr û ramanên wî hebûye.

1. DI RAMAN Ê HIZRÊN BATEYÎ DE QURANA PÎROZ

Bi sedema ku Quran bi zimanê 'erebî nazil bûye, ji bo vê yekê xwendin û nivîsandin di nav gelên misliman de -bi taybetî ewên ku 'Ereb nebûn- bi zimanê 'erebî bûye. Hemû zanistên wekî tefsîr, hedîs, fiqh û belaxe bi zimanê 'erebî dihatin xwendin. Ev zanistên han jî ji xwe bi Quranê ve eleqedar bûn. Ji ber vê yekê rengvedana ayet û çîrok û peyvên Quranê bi temamî di nav helbestên helbestvanên Kurd a kilasîk ên mîna Melayê Cizîrî û Ehmedê Xanî û Nalî û Mehwi û Bateyî û hwd de diyar û xuyayî ne.⁵³

Helbestên van helbestvanan ji bo zêdetir xuya kirin û ronîkirina wate û mebestên ayetên Quranê bûne. Her wiha Qurana Pîroz çavkaniya peyv û guftarên ciwan û lihevhatî û rewan bûye. Ev cure helbestên han jî di nav xelkî de zûtir dihatin qebûlkirin û gel çêjeke zêde ji wan digirtin.

Qurana Pîroz di nav helbestên Bateyî de bi gelek şêwaz û cureyên cudacuda reng vedane. Hinek caran bi şêwazeke zindî ayet hatine bikaranîn. Hinek caran jî bi tenê wateyên ayetan û bûyer û çîrokên Quranê xistiye nav helbestên xwe.

1.1. Bikaranîna Ayet û Biwêjên Quranê

Eger em biçin nav deqên helbestên Bateyî gelek ayetên Qurana Pîroz dibînin ku Bateyî bikar aniye, Bateyî bê ku destkariyê di wan de bike wan ayetan wekî xwe bikar aniye.

Mînak:

Fexra melean padişahê textê medîne

Yek lehze geha 'erşê xeraman bi meşîne

⁵³ Emîn Mutabçî, "Quran Di Helbestên Cizîrî De" *K.Roşinbîrî Newê*, J. 105, 1985 Bexdad, r 205.

Neh çerxê felek bot e ne sergeşte hezîn e

*Têk bûne xusaret **weseyeslewne se'îra***

*Ursîle îlel xelqî **beşîren we nezîra** (p.x, r. 81)*

(Weseyeslewne se'îra- Sûreya Nîsa Ayeta 10 an)

(Beşîren we nezîra- Sûreya Beqere Ayeta 119 an)

Çi xulxul hate ez xebra

Sedayê gunbeda xedra

*Ke **subhanellezî esra***

Ji Qudsê çûye dîwanê (p.x, r. 87)

(Subhanellezî esra- Sûreya Îsra Ayeta 1an)

Ji şeklê Adem û Nûhî

Çi bêjim husnê teqwîmê

Nefextû fihî mîn rûhî

Be'îde bête tefhîmê (p.x, r. 154)

(Nefextû fihî mîn rûhî - Sûreta Taha Ayeta 72 an)

'Ebîr û beynî zûlfeynî

*Xudanê **qabe qewseyn î***

Li ser çavêt me ne'leyn î

Binêr ey da'îya serwer (p.x, r. 91)

(Qabe Qewseynî – Sûreta Necim Ayeta 9 an)

Melek hatin bi te'cîlî

Du şeq kir sîne cebrîlî

Elem neşreh tê tenzîlî

Dikit tewzîh û tibyanê (p.x, r. 84)

(Elem neşreh - Sûreya el Şerih Ayeta 1 an)

Haşa hebin 'uzw û cesed

Tehwîlê îmkanê xired

We lem yekun kufwen ehed

Zatê qedîm her dê hebî (p.x, r. 65)

(Welem yekun kufwen ehed - Sûreta el Îxlas Ayeta 4 an)

Bexşendê her ecram û 'erş

Anî zuhûrê mulkê ferş

Summestewa balayê 'erş

Mîrê ezel tuy ya Rebî (p.x, r. 67)

(Summestewa- Sûreta E'raf Ayeta 54 an)

Bi xakê pakê yesrîb

Bi bangê subh û mexrîb

Bi sucdeya weqterîb

Bi lewh û 'erşê 'ezîm (p.x, r. 77)

(Weqterîb - Sûreta el 'Eleq Ayeta 19 an)

Her wiha Bateyî van ayet û biwêjên Quranî bikar aniye. Înna fetehna, heblul werîd, limenîl mulk, tehtessera, qelbê selîm, Xefûr-ur Rehîm, Rebul 'alemîn, Ûmûl qûrq, Maremeyte, Sebîlillah û beytul heram.

Bi hindek destkarîkirinê di wan de van her du ayetan bikar aniye. Fî cîdî heblun mîn mesed, îhdîna ye reb sîrate'l musteqîm.

Hêvîdar în em ji te Şahê Kerîm

Îhdîna ya reb sîrat-el mueteqîm⁵⁴

(Îhdîna ya reb sîrat-el mueteqîm- Sûreta –el Fatihe Ayeta 6 an)

Hûn bêjine munzeyyiran

Ey meclisa yar û biran

Bateyî kusa çît leşkeran

Fî cîdî heblûn mîn mesed (p.x, r. 112)

(Fî cîdî heblûn mîn mesed- Sûreta –el Mesed Ayeta 5 an)

⁵⁴ Şemrexî, *b.n.b*, r. 10.

1.2. Bikaranîna Peyvên Quranê

Melayê Bateyî di nav helbestên xwe de dehan peyvên berçav ên Xwedayê mezin ku di Quranê de jî hene bikar aniye. Ew ji bo mebesta zêdetir bihêzkirina helbestên xwe bûye. Lê li aliyê din ew wate digeyine ku naveroka Qurana pîroz karîgeriyê li hizr û ramanên Bateyî kiriye. Mîna Îlah, Xefûr, Seqf, Sema, 'Eş, Cin, Ezm, Remîm, Îns, Kursî, Hey, Mecîd, Şerîk, Dehr, Tîn, Rûh, Reb, Sebr, Sekînet, Xaliq, Ha Mîm, Heqq, Fedl, Suhûf, Beşîr, Se'îr, Nezîr, Remîm, Mîzan, Încîl, Tewrat, Kewser, Firdews, Cibraîl, Selsebîl û Cennat.)

Ey le'lê lebit ezmê remîmî diket ehya

Ber şewqa rûyê te bûye sergeşte sureyya (p.x, r. 81)

Ya îlahî tu kerîm î

Yu xefûr î tu 'ezîm î

Ji ezel da tu qedîm î

Melikê seqfê sema yî (p.x, r. 53)

Xadîm ji bo wî cibraîl

Mensûx kirin tewrat û incîl

Mesken ji bo wî selsebîl

Kanê muhemmed mustefa (p.x, r. 135)

Bi wê beyta di hacatê

Dixwûm sondê bi ayatê

Nehin ew reng di cennatê

Munewwer bû di nûrê da (p.x, r. 146)

1.3. Amajekirin bi Qiseyên Quranê

Melayê Bateyî di nav helbestên xwe de amaje bi gelek qiseyên Quranê kiriye û vê yekê di nav helbestên xwe de di çarçoveya hunereke ciwan û bilind de bikar aniye.

Bê hebîb im bê tebîb im hem xerîb im bê weten

Şubhî Ye'qûbî ji 'işqa Yûsifê gulpîrehan (p.x, r. 105)

(Îşareta bo çîroka Nebî Ye'qûb)

Wadiya eymen ku tarî bît kî ye feryadres

Ma ji Totî dê tinê helbît li min nûrîn qebes (p.x, r. 144)

(Îşareta bo çîroka Nebî Mûsa)

Hudhude ger ku xuya bît

Bêt ji Belqîsê seba

Pê mufferreh bît suleyman

Mutmeîn bît cane me (p.x, r. 133)

(Îşareta bo çîroka Nebî Suleyman)

1.4. Bikaranîna Wateya Ayetan

Ji bilî vê yekê Bateyî wateya gelek ayet û biwêj û peyvên Quranê bi zimanê Kurdî bikar aniyê. Ew jî bûye sedema wê yekê ku helbestên wî hêsan û zelal bin û di nav hizr û bîrên xwendevanan de ji bo maweyeke dirêj bimînîn û karîgeriya xwe çê bikin.

Taha tu resûlê mekikê erşê 'ezîm î

Der dbehrê cemalê tu tenê durra yetîm î

*Ehsentirî ez **yûsifê siddîq** û yetîm î*

Lu'lû sifetî der sedefê behra kerîm î (p.x, r. 80)

(Yûsifê siddîq- يوسف ايها الصيق افتنا في سبع بقرات - Sûreta yûsif Ayeta 46 an)

Subhan ji mîrê qadirî

Adem ji tînê çêkirî

Qalib bi rûhê hey kirî

Wesfan çi bêjim ya Rebbî (p.x, r. 65)

(Adem ji tînê çêkirî- وبدأ خلق الانسان من طين - sûreta secde Ayeta 7 an)

Bê cins û bê nezîrî

Bê kuf û bê mîsalî (p.x, r 56)

(sûreta Îxlas Ayeta 3 û 4 an) - لم يلد ولم يولد ولم يكن له كفوا احد)

'Alimê esrar û bal

Muhewwilê kullû hal (p.x, r. 76)

(*'Alimê esrar û bal* - عالم الغيب والشهادة وهو الحكيم الخبير - sûreta en'am Ayeta 73 an)

Ey serwerê dîn mehbetê ayatê mukerrem

Îsmê te di hindî suhûfan bûye mufexxem

Lutfa te şeyatîn ji sema kirine mureccem

Ger dê tu nebûya nedibû çerxê mu'ezzem (p.x, r. 80)

(*Şeyatîn ji sema kirine mureccem* - فمن يستمع الان يجد له شهابا رسدا - sûreta el-cin Ayeta 9 an)

1.5. Navên Quranê Di Nav Helbestên Bateyî Da

Bateyî di helbestên xwe de bi tenê navên Quranê neaniye, belkî bi navên çendîn cureyên cudacuda ve ba kiriye. Her yek ji wan wateya xwe ya teybet heye. Hemû navên ku Bateyî bikar aniye di nav Quranê de jî derbas dibin. Bateyî hewil daye ku Quran di kesayetiyê Pêxember de nêzîk bike, wan herdukan têkelî hev du bike, bi şêwazekî wiha ku her kes helbestên wî bixwîne, ew tişt bide famkirin ku Quran kitêbeke asmanî ye û ji aliyê Xwedê ji bo Pêxember Muhemmed (s.x.l) nazil bûye. Bi piranî Bateyî wan navên Quranê bikar aniye.

1.5.1. Quran

Îmamê enbiyanî tu

Li Qur'anê xudanî tu (p.x, r. 90)

1.5.2. Furqan

Muhemmed seyyîdê 'alem

Şefî'ê roja mîzanê

Çiraxê dîdeyê Adem

Xwedanê wehy û Furqanê (p.x, r. 83)

Em dikarin bêjin ku Quranê bi piranî weke faktoreke karîger roleke mezin hebûye di binyad û dariştina hizra Bateyî de.

2. XWEDANASÎ LI CEM BATEYÎ

Di wêjeya klasîk a kurmançî da bi giştî reh û karaktereke xwe ya dînî heye. Cizîrî, Feqî, Xanî û Bazîdî hemû kesayetên olî û xwedî wêjeyên olî ne. Lê ji nav klasîkên kurmançî helbestkarê herî olî û yê herî tûj qet bêguman Bateyî ye.⁵⁵

Bateyî di nav malbateka oldar û xwedênas da mezin bûye, ku bav û bapîrên wî kesên oldar û mela bûne. Bi xwe jî di despêkê de li cem malbata xwe hînî xwendin û nivîsandinê bûye û dersên dînî wergirtiye. Paşê li cem hinek melayên mezin ê herêmê xwendina xwe pêşve dibe û îcazeya meletiyê distîne. Herî dawiyê di mizgeftê de dibe mela û wekî zanayekî mezin ê dînî derdikeve û îrşada xelkî dike ji bo xwedênasîn û qewîkirina girêdana wan a bi dîn ve⁵⁶

Bateyî wekî xwedênasek û dîndarekî serdema xwe ne bi tenê xwe bi dersgotinê ve girtiye lê wî helbestê jî kiriye navgînek ji bo nasîna Xwedê û Pêxember û hînkirina binemayên îman û Îslamê. Xwedênasîn li cem Bateyî xwediyê rûbereke fireh e ku ev yek di nav helbestên wî de jî diyar dibin. Bi şêweyek gelek parçe helbestên xwe ji bo vî warî terxan kirine. Mîna, Ya Îlahî tu Kerîmî, heqqe tu Padîşah î, Subhan ji Mîrê Qadirî, Ya Îlahî ez xerîb im, Ya rebbena Qadir tu yî û La hewle la quwwete. Di rastiyê de di helbestên Bateyî de tevahiya ew mijarên ku derbarê xwedênasînê de derketine holê bingeha xwe ji Quranê digirin.

Bateyî Xweda-hez-ek e, ew dilketiyê Xwedê ye. Ji ber ku Xwedê"baş" e, "bedew" e, "rast" e, "mezin" e, "heye" e, "kur" e, "berz" e, "hêz" e û "zane" û "dost" e, ancax heyîneke wek wî dikare bibe mijara helbestê.⁵⁷

Subhan ji mîrê qadirî

Adem ji tîne çêkirî

Qalib bi ruhê hey kirî

Wasfan çî bêjim ya rebbî (p.x, r. 65)

⁵⁵ Rênas Jiyan, *b.n.b.*, r. 8.

⁵⁶ Rênas Jiyan, *b.n.b.*, r. 7.

⁵⁷ Rênas Jiyan, *b.n.b.*, r. 15.

2.1. Nav û Sifetên Xweda

Bateyî giringiyeke zêde bi navên Xwedê daye û di çendîn cihên cudacuda de amaje bi gelek navên Xwedê kiriye. Li cem Bateyî bikaranîna her yek ji navên Xwedê her car ji bo mebesteke taybet bûye. Wekî Xeffar, di demên duakirinê de ji bo bexşandina ji gunehan de. Kerîm, di dema daxwaza merhemetkirinê de. Qadir, di dema qelsbûnê de. Xaliq, ji bo mezinahiya Xwedê. Hemîd, ji bo hemd û sena hwd. hatine bikaranîn.

Bi giştî Bateyî amaje bi van navên Xwedayê mezin kiriye: Ellah, Qadir, Heqq, Daîm, 'Elîm, Xaliq, 'Ezîm, Kerîm, Qedîm, Ehed, Rezzaq, Semî', Besîr, Qehhar, Xefûr, Semed, Hey, Mecîd, Ferd, Hadî, Hemîd, Îlah, Zahir, Ewwel, Axîr, Munteqîm, Nûr, Baqî, Hekem, Malik, 'Alî, Wahid, Rehman, Wekîl, Cemîl.

*Ya **Îlahî** tu **Kerîm** î
Tu **xefûr** î tu **'ezîm** î
Ji ezel da tu **qedîm** î
Melikê seqfê sema yî (p.x, r. 53)*

*Ey **rahimê** **rehma** **qedîm**
Hem **daîm** û **heqq** û **elîm**
Cumleyê **derdan** tuy **hekîm**
Ez dê ji kê **gazinde** kem (p.x, r. 74)*

*Tu **wekîl** î tu **delîl** î
Tu **'ezîm** î tu **celîl** î
Tu **'ezîm** î û **cemîl** î
Bi **tekebur** tu **siza** yî (p.x, r. 54)*

*Zatê **Qedîm** û **pakî** ye
Heyy û **'Elîm** û **Hadî** ye
Navek **'ezîm** û **'Alî** ye
Ê **sermedî** dê ji **xwo** we **bî** (p.x, r. 65)*

Semed û Heyy û Mecîdî

Qurbetê "heblul werîd"î

Ehed û ferd û hemîd î

Layiqê hemd û sena yî (p.x, r. 53)

Herwiha di Helbestên Bateyî de navên Xwedê herweke “Allah, Xweda, Reb, Sultan, Xwedawend, Îlah, Padîşah, Mîr” hatiye bikaranîn.

Ya rebbena qadir tu yî

Ez dê ji kê gazinde kem

Derdê dilan derman tu yî

Ez dê ji kê gazinde kem (p.x, r. 74)

Heqqa tu padîşah î

Rezzaqê cinn û ins î (p.x, r. 56)

Mim mîrekê xeffar heye

Sultaneke settar heye (p.x, r. 67)

Ya Îlahî tu kerîm î

Tu xefûr î tu ezîm î (p.x, r. 53)

Tu xwdawendê spihr î

Tu Xwedanê meh û mihr î (p.x, r. 53)

Ya Xweda ger me nebexşî

Ay û ay û ay û ayî (p.x, r. 55)

2.2. Nasîna Xwedê

Mijara nasîna Xwedê di nav helbestên Bateyî de mijareke serekî ye. Li dinyayê derdekî wî heye ew jî Xweda ye. Bateyî xwedî êşeke mezin e, gav û saet ji bo Xwedê diêşe. Bateyî nexweşek e, bi tenê "dermen"ekî wî heye, ev derman "Xweda"ye.⁵⁸

Dilim kul e bi xûşîne

Ji ber birîna tijî xwîn e

Bi dermana hekîm nîn e

Ya reb tu yî dermanê min (p.x, r. 72)

Bateyî hewil daye vê babatê bi rêka helbestê ve şîrove bike û bigihîne xelkî. Helbestê wekî amrazekî bikar aniye. Wate em dikarin bêjin ku Bateyî helbestê ji bo gihandina armanca xwe nêziktirîn rêk zaniye. Lewra helbest zû digihê xelkî, her wiha ji aliyekî ve zimanê helbestên wî zimaneke kurdî bûye. Her kesî bi hêsanî jê fam kiriye, ji aliyêke din ve hînkirin bi rêya helbestê ve hêsantir e ji wê rêbaza ku di hucreyên medreseyan de dihat xwendin. Her çiqas behskirina mijara nasîna Xwedê kareke zehmet e û pêwîstî bi hizrê heye, lêbelê Bateyî hewil daye ku bi şêwazeke hêsan û vekirî behsa vê mijarê bike. Bi awayekî ku xelkê asayî û nexwendî jî bikaribin helbestên wî jiber bikin û ji mijarên naveroka wan fêhm bikin. Ew cure awaya ku li cem Bateyî dixuyê li cem tu helbestvaneke din a Kurd xuya nake. Lewra mijara herî sereke di nav helbestên Bateyî de mijara xwedênasiyê û hezkirina Xwedê ye. Bi giştî mijara naskirina Xwedê li cem Bateyî di van xalên jêr de xûya dibe.

Bateyî behsa wê yekê dike ku Xwedê razîqê mirovan û xaliqê dinyayê ye.

Heqqa tu Padîşah î

Rezzaqê Cinn û Ins î

Xwedayê mûr û mah î

Munşiyê 'erş û kurs î (p.x, r. 56)

Her wiha her ew ê ku dikare di gunahên 'ebdên xwe bibore Xwedê ye.

⁵⁸ Rênas Jiyan, *b.n.b.*, r. 15.

Bexşendeyê gunah î
Bê esl û fesl û cins î (p.x, r. 56)

Bateyî helbesteka din da jî dibêje:

Xwedê li çi kesan nebûye û kes jî li wî zêde nabe û ew naşibe çi kesan, hemû tiştan dibihîse û dibîne, çu tişt li wî winda nabe, hêz û desthilata wî li ser hemî bûneweran de heye.

Bê cins û bê nezîr î
Bê kuf û bê mîsal î
Semî'î û besîr î
Qehharê la yezal î
Ellameyê qedîr î
Te'ala şenê 'alî (p.x, r. 56)

Mirov her çi wesfek ji bo Xwedê bike rast dernaçe, lewra mirov nikare bi eqlê xwe yê kurt çawaniya Xwedê nîşan bide, ji ber wî yekê Bateyî dibêje Xweda ne nizm e û ne bilind e ku di bîra me de ye, nabe mirov hizir bikin derbarê çawanî û çendîtiya Xwedê de, çunkî ev hewleke bêarmanc e û ew ji van tiştan pak û munezeh e.

Tu ne nizmî ne bilind î
Tu ne çûn î ne çend î
Tu munezzah ji du zend î
Tu muqeddes ji yed û pay (p.x, r. 53)

Xwedê ne hebûneke madî ye, rast e ku Xwedê xwediye dest û çav û guh e lê ne wekî ew endamên me ne yan ewên ku di bîra me ji bo wî diçe. Ey Xwedê tu her dem ji hemû tiştan agahdar î û tu ne xwediye sifeteke wisa yî ku ji bo te bibe kêmasî, her çend ku cih û warê te nîne lê tu li her derê heyî.

Te ne xab e te ne xurd e
Te ne mal e te ne perd e
Te mekan nîne li erd e

Tu wekîlê hemî cay î (p.x, r. 54)

Ne reng ne deng ne jî awaza te heye, ew hemû sifetên mirovan in. Tu jî ji van sifetan pak û munezzeh î. Herçende ku tu xwediyê ew hemû desthilat û sifetên mezin î lê çi kes nizane tu çawa yî, çunkî eqlê mirov derk bi te nake.

Te ne lewn e te ne reng e

Te ne awaz û ne deng e

Te ne endam û ne çeng e

Kes nizanî tu kusa yî (p.x, r. 54)

Her çi mal û mulk hene yê te ne, dibin destê te de ye. Her tişt ji bin desthilata te de derbas dibe. Erd û ezman, heyv û roj, tevekê stêrkan, av û ax , hemû tev de mulkên te ne.

Tu Xwedawendê spihr î

Tu Xwedanê meh û mihr î

Tu Xwedanê çem û nehr î

Tu Xwedawendê 'eta yî (p.x, r. 53)

Mezinahî û desthilat ê te ye û bitenê tu xwediyê van sifetên berz û bilind î. Keseke din digel te beşdar nîne. Tu yek î û bê şîrîk î.

Te ne misl û ne refîq e

Te ne çeft e û ne şerîk e

Feteala çi melîk e

Mekikê dehr û sema yî (p.x, r. 54)

Xwedayê mezin dermanê hemû derdan e, tîmarkerê hemû birînan e. Bateyî dibêje: Eger Xwedê derd û kulên min qenc neke, bi tu tebîb û hekîman ve nayê tîmarkirin.

Eger hekîm Îsa bitin

Loqman ji qebra rabin

Daxa dila sax nabin

Ya reb tu yî dermanê min (p.x, r. 72)

Mirov li hember hêz û desthilata Xwedayê mezin bêhêz in. Desthilata Xwedê di ser hemû tiştan de serdest e, ji alîkî dinê ve hêminiya jiyan û bexşîna aramiyê ji bo dilan bi Xwedê ye û ji bilî Xwedê bi keseke dinê ve ev tiştên han nayên kirin.

La hewle la quwwete

Îlla billahîl 'Ezîm

La seyre la seknete

Îlla bike ya 'Elîm (p.x, r. 76)

Xweda ji kêmaniyê pak û munezeh e, xwediyê lutf û mihrebaniyê ye, li her cihê amade ye, tu cih tune ku ew lê nebe.

'Alî ji e'razan we ne

Lutf û kerem her wî hene

Hakim ew e bê meskene

Erdek heye ew lê nebî? (p.x, r. 65)

Ji bo mirovan deriyê herî nêzîk deriyê Xwedê ye, herdem amade ye ku bersivê bide pêwîstiyên ebdên xwe, lêbelê mirov gelek caran terka riya Xwedê dikin û jê dûr dikevin.

Ya Reb tu yî ji nûrî tu

Sultanê jêr û jûr î tu

Her hazir î ney dûr î tu

Dûriyek hebî ew dê ji me bî (p.x, r. 66)

Xwedayê mezin ji hemû tiştên razber û veşartî haydar e. Eger ew tişta nediyar tişta herî biçûk be û di şeva herî tarî de be.

'Alimê esrar û bal
Muhewwilê kullû hal
Sirra te ye min xeyal
Şewqa te ye min nedîm (p.x, r. 76)

2.3. Erk û Peywirên Mirovên li Hember Xwedê

Bateyî dibêje: Berî her tiştî divê mirov baweriya xwe bi Xwedê û sifetên wî bîne û mirovên din di vî warî de perwerde bike.

Wesfê di mîrê ekber e
Kê taqet e ket defter e
Her wahîdê witr e fer e
Haşa ku wî 'uzwek hebî (p.x, r. 65)

Haşa hebin 'uzw û cesed
Tehwîlê îmkanê xired
Welem yekun kufwen ehed
Zatê qedîm her dê hebî (p.x, r. 65)

Piştî baweranînê divê ebd şanaziyê bi wê yekê bike ku ew xwediye Xwedayekî mezin û beşîner û desthilatdar e.

Min mîrekê xeffar heye
Sultanekê settar heye
Hêj min huba pêrar heye
Ya reb derê feyzê vebî (p.x, r. 67)

Bateyî ji me re dibêje ku mirovên Xwedênas divê bi tenê destê duayan ji bo Xwedayê xwe bilind bike û pêwîstiyên xwe ji wî bixwaze.

Ya Îlahî ez xerîb im
Daîma her dilkebîb im

Bê hebîb û bê tebîb im
Mem di nav qewmê xerîb (p.x, r. 68)
Ya reb hewar sed car hewar
Perwane qet nakit qerar
Xweş muhbetê havêtî nar
Ya reb tu yî dermanê min (p.x, r. 71)

Sed car hewaran dikemê
Ya agehdarê 'alemê (p.x, r. 71)

Ya reb bikey tu bi nesîb
Tecellaya husna hebîb (p.x, r. 71)

Bateyî ji bilî Xwedê yekî din bi şayeste nabîne heta gilî û gazindeyên xwe li cem wî bike û derdên xwe derman bike.

Ya rebbena qadir tu yî
Ez dê ji kî gazinde kem
Derdê dilan derman tu yî
Ez dê ji kî gazinde kem (p.x, r. 74)

Mirov gave ku li xwedê digire û xwe diavêje hembêza wî, ruh û cane mirovî rehet dibe, Xwedê xwedî ye, Xweda rehman e, Xweda derman e.⁵⁹

Te hey kirin en rûh û can
Derd û bela her êş û jan
Nalîn ji min çûn asiman
Ez dê ji kê gazinde kem (p.x, r. 74)

Pêwîst e mirov girêdayî ew peymanên xwe yên ku dane Xwedê be û li hember Xwedê xwe şermezar bizane.

⁵⁹ Rênas Jiyan, *b.n.b.*, r. 16.

Xaliq tu yî ez bende me
Wellah li ser 'ehda xwe me
Billah ji te şermende me
Ez dê ji kî gazinde kem (p.x, r. 75)

Divê mirov li hember ew nî'metên ku Xwedê dane wî her dem ji Xwedê re hemd û senayê bike. Bateyî sipasiya Xwedayê mezin dike ji ber ku nûra îmanê di dilê wî de heye û riya rast li ber wî winda nebûye.

Şukurullah min ji hubba dilberê ava ye dil
Sal û mahan daîma min hem mehî 'enqa ye dil (p.x, r. 142)

Sipas û hemd û sena bi tenê şayesteyê Xwedayê mezin e.

Semed û heyy û mecîd î
Qurbetê "heblul werîd"î
Ehed û ferd û hemîd î
Latîqê hemd û sena yî (p.x, r. 53)

2. LI ALIYÊ BATEYÎ VE KESAYETIYA PÊXEMBER(S.X.L)

Pêxemberê ummetê Muhemmed(s.x.l), kurê Ebdullah kurê Ebdulmutilib kurê haşim e. Wî Ji Qureşiya, ji bavikê haşimî ye. Di nav Ereban de haşimî bavikê herî bi şeref û pak û bi rûmet e. Kalikê wî Ebdulmutilib û apê wî Ebûtalib şerîfê Qureşiyên bûn.⁶⁰

Kesayetiya pêxember muhemmed (s.x.l) xwedî payeyeke mezin û berz e li cem Bateyî. Bi corek ve ku Bateyî gelek helbestên xwe bi taybet nivîsandiye ji bo behskirina li ser jiyana û kesayetiya wî, mîna: Muhemmed seyidê 'alem, Hilo rabe ebul-qasim, Eyne'tê te ez 'erşê heta ferşê şehîra, Muhemmed sahibê tacê, Kanê Muhemmed Mustefa. Her wiha Bateyî xwediyê yekemîn mewlûdnameyê ye ku li ser

⁶⁰ Ebdulhadî Botî, *Pêxemberê Ummetê Hz.Muhemmed (s.x.l)*, Ç. Sêyem, Weş. Nûbihar, Stenbol 2011, r. 21.

jiyan û jidayikbûna pêxember muhemmed (s.x.1) bi zimanê kurdî kurmancî nivîsiye⁶¹.

Baweriya Bateyî ew e ku beriya hemû mexlûqan kesayetiya pêxember (s.x.1) hebûye û herçê tiştên ku li erd û ezmanan hene ji bo wî çêbûne. Eger ne ji bo xatirê wî ba Xwedê jiyan nedixuluqand.

Ji bo wî çêbû ev 'alm

Nebî bû hêj herî Adem

Di exbara wekû xatem

Çiraxê ehlê Îmanê (p.x, r. 85)

yan dibêje:

Ey serwerê dîn mehbetê ayatê mukerrem

Îsmê te di hindî suhûfan bûye mufexxeem

Lutfâ te şeyatîn ji sama kirine mureccem

Ger dê tu nebûye nedibû çerxê mu'ezzem (p.x, r. 80)

Bateyî dibêje ku pêxember (s.x.1) di jiyana xwe de xwediyê gelek mu'cîzan bûye, di nav helbestên xwe de îşare bi gelek mu'cîzeyên wî dike; mina: Bûyera qelişandina singê wî ji aliyê melekan ve û bûyera îsra û mî'racê.

Mu'ciz ji bo pîr bûn gelek

Heft asîman hem neh felek

Xadim ji bo wî bûn gelek

Kanê muhemmed mustefa (p.x, r. 134)

Herwiha dibêje:

⁶¹ İlhan, *b.n.b.*, r. 10.

Melek hatin bi te'cîlî

Du şeq kir sine cibrîlî

Elem neşreh tê tenzîlî

Diket tewzîh û tibyanê (p.x, r. 84)

Her wiha îşare bi werbûna pûtên Mekkehê û lertzîn û şeqbûna Qesra Kîsra ku melîkê faris bû dike dema ku Pêxember(s.x.1) ji dayik bûye.

Bi ayat û bi tewhîdê

Ji teşrîfê û temcîdê

Şeva xurrem di tewlîdê

Senem hûr bûn di pûtexanê (p.x, r. 83)

Nigûnser bûn senem 'aciz

Ji tewlîda gula qurmiz

Bi kesrayî geha mu'ciz

Tezelzul kefte eywanê (p.x, r 83)

Li aliyê Bateyî ve peywendiyêke bihêz di navbera dunya û Pêxember (s.x.1) de heye, bi şeweyek piştî mirina pêxember (s.x.1) dunya rûbirûyê coş û xiroşan bûye û sebr û aramiya wê nemaye.

Ey le'le lebit ezmê remîmî diket ehya

Ber şewqa rûyê te bûye sergeşte sureyya

Cûşan û xurûşan ji fîraqa tene derya (p.x, r. 81)

Li gorî Bateyî pêxember rêberê hemû Pêxemberan e û şivanê ummeta îslamê ye, her bi sedema Pêxember ve ummeta wî bûye çêtirîn û navdartirîn ummeta rûyê erdê.

Îmamê enbiyanî tu

Li qur'anê xudanî tu

Pez in em xweş şivanî tu

Şivenê ûmmetê yekser (p.x, r. 90)

Yan dibêje:

Em kirîne ummeta xeyr ul-beşer

*Tabî'ê wî muqtedayê namiwer*⁶²

Pêxember (s.x.l) tu tiştî ji ber xwe ve nake û nabêje, hemû ji aliyê Xwedê ve ye, kirin û gotinên wî ji Xwedê ne.

Ma remeyte îz remeyte gûşidar

*Destê wî destê Xweda der kar û bar*⁶³

Bateyî dibêje bi hatina pêxember û Quran ve hemû dinên din mensûx bûne û êdî kar bi wan nayê kirin. Bi tenê îslam wekî dîneke rast ê Xwedê maye, Muhemmed wekî Pêxemberê dawîya hemû Pêxemberan dive bawerî pê bê kirin.

Bi hukmê seyyîdê mursel

Nebîyyê axir û ewwel

Betal kir dîniha mucmel

Bi ayat û bi Qur'anê (p.x, r. 83)

⁶² Şemrexî, *b.n.b.*, r. 9.

⁶³ Şemrexî, *b.n.b.*, r. 11.

Baweriya Bateyî ew e ku Xwedê Pêxember (s.x.l) ji bo hemû mirovan şandiye, ta ku mirovan bi agirê cehennemê ve bitirsîne û mizginiya bihuştê bide wan.

Qed kane lekel fedlû lekel cûdû kesîra

Ursîlte îlel xelqî beşîren we nezîra (p.x, r. 80)

ji ber vê yekê bi baweriya Bateyî divê hemû mirov xwe li riya wî bigirin û baweriya xwe pê bînin. Kesên ku bawerî bi wî neynin di dunya û qiyametê de rastî xusranê tên.

Herçî ku bi şer'a te 'emeldar in di dunya

Kanet lehum el xuldû herîren we serîra (p.x, r. 81)

Herçî go neînit bi te îman û yeqîn e

Têk bûne xusaret we weseyesleyne se'îra (p.x, r. 81)

Bateyî daxwaz ji nefsa xwe û ji hemû kesan dike ku nabe ku ew piştta xwe bidin sunneta pêxember, heta meriv li jiyane be lazim e meriv li ser kirin û gotinên Pêxember bijî.

Qewlê wî da xafil nebî

Heta tenefus dê hebî

Sellû 'ela rûhul nebî

Kanê muhemmed mustefa (p.x, r. 136)

Ji ber vê yekê Bateyî fexir û şanaziyê dike ku ew musulman e û baweriya wî bi Pêxember (s.x.l) heye û li ser rê û rêbaza wî ye.

Ev e mehbûb ev e taha

Ev e taca serê şaha

Ev şemsa li nîv maha

Li me xweş bû musulmanî (p.x, r. 93)

Kesayetiya Pêxember li aliyê Bateyî kesayetiyek e kamil û bêkêmanî ye. Ev taybetmendî jî bi tenê li cem Pêxember heye, li cem tu kesekî din tune ye.

Ji însanan te yî kamil

Lew min tu kirî wasil

Tu çi bixwazî bikim hasil

Me we'da te li xwe danî (p.x, r. 95)

3.1. Bateyî û Dîtina Wî ya Pêxember (s.x.l) a di Xew da

Xweşdivî û dûriya Pêxember (s.x.l) mîna agirekî di nav dilê Bateyî de hil bûye, ew daxwaza rehmet û şefaetê ji Pêxember dike daku ev agirê ku wî girtiye vemire.

Ji nav vê merqeda nûrîn

Hilo taha hilo yasîn

Ji dûr sotîn emêt miskîn

Hilo mehderçiyê mehşer (p.x, r. 89)

Tu yî da'î hebîbellah

Fîraqê sotîn em wellah

Terehhem ya nebiyyallah

Li mehcûran hilo binker (p.x, r. 91)

Bateyî di dinyayê de ji du tiştan hez dike û ji bo wan dijî: a yekem Xwedê ye, a duyem Muhemmed e.

Kovana min muhemmed e

Ji bo roja qiyamet e (p.x, r. 73)

Bateyî ji ber dûriya Pêxember(s.x.l), xwe bi xerîb dizane, mina nebî Ye'qûb ku ji Yûsuf dûr maye ew jî rû bi rûyê derd û xem û azar bûye.

Derd û dax im bê qerar im bê bihar im bê çemen

Bê hebîb im bê tebîb im hem xerîb im bê weten

Şubhî ye'qûbî ji 'îşqa yûsufê gulpîrehan

Mûnîsê derd û xeman im sakinê beytul hezen (p.x, r. 105)

Ji ber wê yekê Bateyî penah ji bo Xwedê dibe û daxwaz ji wî dike ku êş û azarên wî dawî bike, çûnkî li gorî Bateyî bi tenê Xwedê dikare şîfayê bide nexweşan.

Ya reb hewar sed car hewar

Perwane qet nakit qerar

Xweş muhbetê havêtî nar

Ya reb tu yî dermanê min (p.x, r. 71)

Vê elemê derman bike

Sirra ezel zahir bike

Daxa dilan hasil bike

Ya reb tu yî dermanê min (p.x, r. 71)

Êş û jan ji aliyê bateyî ve xweşdivî ye ji bo Pêxember (s.x.1), derman jî sebr û aramî ye, Xwedê dikare bide wî.

Elem çi ye muhebbet e

Derman sebr û sekînet e

Ya reb bikey bi qismet e

Ya reb tu yî dermanê min (p.x, r. 71)

Bateyî daxwaz ji Xwedê dike ku ruyê xweşdiviyê wî nîşanî wî bide, da ku derd û êş li ser wî sivik bibe.

Ya reb bikey tu bi nesîb

Tecellaya husna hebîb

Derman bikey dilê xerîb

Ya reb tu yî dermanê min (p.x, r. 71)

Dîsa dibêje:

Emîrê textê 'uqbayê

Siha wî dara tûbayê

Xwezî carek di dinyayê

Bidîta min tu wî anê (p.x, r. 85)

Di helbesteke xwe de Bateyî ewe nîşanî me dide ku Xwedê daxwaza wî aniye cî û wî hebîba xwe di xew de dîtiye.

Îro me dî newmek çi xweş

Lew min hebîb wê hat bimeş

Dêmê mu'enber ebrû reş

Xala li dêmê pal veda (p.x, r. 96)

Bateyî bejinziravî û bedewî û rûyê ciwan û çavên belek ên Pêxember(s.x.l) di xew de dîtiye. Dêrde eşqa wî zêdetir dibe û carek dî daxwaz ji Xwedê dike ku hebîba xwe di xew de bibîne.

Ya rebî dîsa muyesser ke ji bo min metlebê

Bê hîcabane bibînin carak dî dêm kewkebê (p.x, r. 143)

3.2. Nav û Paşnavên Pêxember(s.x.l)

Bateyî mîna helbestvanekî mezin gelek kêr navê (Muhemmed) aniye, zêdetir paşnav ji bo Pêxember (s.x.l) bikar aniye. Bateyî gelek paşnavên xweşik di nav helbestên xwe de ji bo pêxember bikar anîne, ew rêbaz wekî rêbaza Qurânî ye, ew rêbaza ku Bateyî bikar aniye li cem helbestvanên din nîne. Bateyî bi piranî van paşnavan ji bo pêxember bikar anîne : “Ebul Qasim, Hebîb, Qasidê Ekber, Taha, Haşir, Fexra Benî Haşim, Rehber, Seyyîdê 'Alem , Xatem, Sehibê Tacê, Çirayê Cinn, Ê Însan, Taca Serê Şah, Behra Kerem, Sexa, Wefa, Mustefa, Şahê 'Ereb, Şahê Letîf, Şeffî', Xwedanê Wehy, Gula Qurmiz, Nabî, Fetahê Dergehê Cennet, Emîrê Sedrê Dîwan, Emîrê Textê 'Uqba, Resûl, Seyyîdê Ehab, Xudanê Mînber, Seyyîdê Sefwet, Xudanê Textêlewlaq, Çiraxê Ehlê Îman, Serwerê Dîn, Yasîn, Îmamê Enbiya, Şivanê Ûmmet, Resûlê 'Erebî, Mehderçiyê Mehşer, Nêrgîza Têrav, Saqî Kewser, Hebîbullah, Mehmûd, Ehmedê Nadir, Emîn, Rehmet, Mîwanê Xweda, Serwer, Murşîd” .

Hilo rabe ebul qasim

Hilo ey qasidê ekber

Hilo fexra benî Haşim

Hilo rabe tu yî rehber (p.x, r. 89)

Hilo ey seyyîdê 'alem

Hilo ey mefxerê Adem

Ji rewzê rabe ya Xatem

Ji nav vê merqeda enwer (p.x, r. 89)

Herweha dibêje:

Resûlê haşimî sabir

Ew e taha ew e haşir (p.x, r. 85)

Dîsa dibêje:

Muhemmed sehibê tacê

Çirayê cinn û însanî

Wekî hebîb çû mi'racê

Meleka şahiyek danî (p.x, r. 93)

Ev e mehbûb ev e taha

Ev e taca serê şaha

Ev e şemsa li nîv maha

Li me xoş bû musulmanî (p.x, r. 93)

Dîsa dibêje:

Kan me'dena sidq û sefa

Kan 'etaya cûd û sexa

Behra kerem kanê wefa

*Kanê muhemmed **mustefa** (p.x, r. 134)*

Herweha dibêje:

Ji bo wî çêbû ev 'alem

Nebî bû hêj herî adem

*Di exbara wekû **xatem***

***Çiraxê ehlê îmanê** (p.x, r. 85)*

Emîrê textê 'uqbayê

Siha wî dara tûbayê

Xwezî carek di dinyayê

***Bidîta min tu wî anê** (p.x, r. 85)*

3.3. Îsra û Mi'rac û Şefa'et di Nav Helbestên Bateyî da

Melayê Bateyî derheqê jiyana Pêxember(s.x.l) de bêtir behsa du buyerên mezin kirine, çendîn car ku di nav helbestên wî de dubare bûne, ew jî Îsra û Mi'rac û Şefa'et e. Diyar e ew du bûyer karîgeriyeke baş li ser hizra Bateyî hebûye.

3.3.1. Îsra û Mi'rac

Îsra û Mi'rac bûyereke dîrokî ye ku di serdema Pêxember (s.x.l) de qewimî ye. Îsra, ji çuyina Pêxember (s.x.l) bi şev ji Mekkê heta Qudsê û ji vegera wî di eynî şevê de re tê goyin. Mi'rac, ji hilketina wî ya asîmana û ji gihaştina wî bi

sidretulmuntehayê re tê gotin⁶⁴. ew buyer di Quranê de bi navê Îsrayê hatiye naskirin. Her wiha ev nav bûye sûret bi navê (Îsra) yê : "sibhane yê ku bi şev rebenê xwe ji mizgefta Heramê bir mizgefta Eqsayê ya ku me hawîrdora wê pîroz kiriye, ji bo em hinek ayetên xwe raberî wî bikin. Bêguman ew kare bihîstin bike û dîtina bide⁶⁵. Di eynî vê Sûretê de, ayeteke din heye, jê xuya dibe ku Pêxember(s.x.l) çî li Ezmanan dîtiye." Û dema me bi te re got ku perwerdîgarê te hawîrdor li xelkê girtiye. Ew dîtina ku me bi te dîtina daye, ew dara lanetbûyî ya di kuranê de, me ew dîtine û ew dara ji xelkê re kire fîtne, ji bo em wan bitirsînin, lê dîsa, ew zêde zordar bûn".⁶⁶ Di şîrovekirina vê ayetê de tê gotin ku Xwedê pêxember bi bîr tîne ku hemû xelk bi zaniest û hêza wî dorpêçe û ji muhemmed dixwaze ku bi xelkê re bibêje ew hemû di mista Xwedê de ne.⁶⁷

Her wiha ew bûyer carek din di sûreta el-Necim de hatiye behskirin. Di vê seredanê de pêxember digel Cibrîl ji sererdê çûye ji bo asmanan. Pêxember Muhemmed (s.x.l) gelek hevdîtin û çavpêkeftin digel pêxemberên din kirine. Her wiha Xwedê bihişt û cehennem nîşanê wî daye. Wî digel Xwedê giftûgo kiriye. Pişt re Xwedê nimêj ji bo ummeta wî kire xelat. Ew bûyer jî piştî ew e hat ku Pêxember (s.x.l) di jiyana xwe de gelek xem û êş dîtin. Xwedê ew tişt da wî heta dilê wî bisekine û aram be.⁶⁸ Ew bûyer ji aliyê Bateyî ve gelek girîng e û wî di gelek helbestên xwe de behsa wê bûyerê kiriye.

Du 'alem pêkve muhtacê

Ji bo wan hatî îxracê

Şeva ew çûye mî'racê

Çi xulxul kete eywanê (p.x, r. 87)

Çi xulxul hate ez xebra

Sedayê gunbeda xedra

⁶⁴ Botî, *b.n.b.*, r. 54.

⁶⁵ Sureta Îsrayê, Ayeta 1 an.

⁶⁶ Sureta Îsrayê, Ayeta 60 an.

⁶⁷ Salih Bozan, *Çiroka Îsra û Mihracê*, Weş. Roşenbîrî, Hewlêr 2013, r. 83.

⁶⁸ Bozan, *b.n.b.*, r. 25 - 35.

Ke subhanellezî esra

Ji qudsê çûye dîwanê (p.x, r. 87)

Dîsa dibêje:

Muhemmed sehibê tacê

Çirayê cinn û însanî

Wekî hebîb çû mi'racê

Meleka şahiyek danî (p.x, r. 93)

Li melekan dibû şahî

Şukur xwestin li îlahî

Tewafa wan wucûd mayî

Xweda ji bo me ra anî (p.x, r. 93)

Wekî ji mekkehê rê ket

Ji wî ra hatibû firset

Ji bo wî zêde bû muhbet

Suwarî çûbû esmanî (p.x, r. 93)

Ev e ew Ehmedê nadir

Wan birr bi birr ziyaret kir

Giha 'erşê muşerref kir

Xuda gotê were banî (p.x, r. 94)

Nidaî hat û kire te'cîl

Bi şevnedihişt Cebreîl

Giha 'erşî bûye delîl

Perde avêt heq subhanî (p.x, r. 94)

Xuda perde hilanî bû

Habîb du caran ew dî bû

Lê heqîqet nezanîbû

Munezzeh ji cism û canî (p.x, r. 95)

3.3.2. Şefa'et

Bûyera olî ye, ku piştî mirina Pêxember diqewime, ew jî şefa'eta pêxember e ji bo ummeta xwe di roja qiyametê de. Li wê rojê fêydeya kesî ji kesî re nîne, her kes mijûlî rizgarkirina giyana xwe ye. Heta pêxemberên din jî nikarin tişteki bikin. Her kes dibêje, “nefsî nefî”. Di wê wext û zemanê de pêxember Muhemmed (s.x.l) ala şefa'etê hildigire û diçe li ber deriyê Xwedê û dibêje “ ummetî ummetî”. Xwedê jî derî ji bo wî vedike û daxwaza wî qebûl dike. Ew jî daxwaza şefa'etê dike. Ew bûyer li cem Bateyî gelek dijwar e û bandorê li ser wî çêkiriye. Jiyan wî xera bûye, tirs roja qiyametê roj bi roj di dilê wî de zêde dibe. Ji ber wê ye ku Bateyî hîvî bi şefa'eta pêxember heye û di helbestên xwe de behs kiriye.

Mînak:

Ey seyîde 'alem senedê nûra hîdayet

Hîvî dîkin em ji te ey sedrê rîsalet

Mehrûm nekî tu me ji dîwana şefe'et

Batey bi cehennem nebirî roja qiyamet (p.x, r. 82)

Herweha dibêje:

Kovana min muhemmed e

Ji bo roja qiyamet e

Bo me biket şefa'et e

Ya reb tu yî dermanê min (p.x, r. 73)

Fekende ser biya derbey

Dikim hîvî ji mîrê heyî

Şefa'et kî ji bo batey

Bide ber zillê seywanê (p.x, r. 87)

Dîsa dibêje:

Here pêşî xudayê me

Rehîm û rehnumayê me

Şefa'et ke xetayê me

Li dîwanê bike mehder (p.x, r. 92)

Herwiha dibêje:

Îlahî lê kire minnet

Şefa'et jê ra kire xil'et

Ji bo ummet kirî rehmet

Wekî roja di mîzanî (p.x, r. 95)

Carek din dibêje:

Nîqab û perdeyan bavê

Li mehcûran dem û gavê

Bi rehmet lê bike avê

Şefa'et ke ji bo mehder (p.x, r. 90)

4. TÊKILIYA BATEYÎ BI TESEWIFÊ RA

Di ziman û edebiyata kurdî de dema ku behsa tesewifê tê kirin zêdetir peyva sofî hatiye bikaranîn. Lêbelê di berhemên farisî de digel wî peyvê, peyva harif jî hatiye bikaranîn.⁶⁹

Di nav wê gotar û babetên ku li ser kesayetiya Bateyî hatine nivîsandin de amajeyeke zindî ya ku elaqeya Bateyî bi tesewifê re nîşan bide tune. Di nav helbestên wî de jî amajeyeke wiha tune ye û bi xwe jî ewe nîşan nedaye ku xwediyê rêbazeke terîqetekê ye. Lê ewe wê wateyê nade ku wî tesewif nenasiye û di kenarên tesewifê de avjenî nekiriye. Tehsîn Doskî di pirtûka xwe de amaje bi wê tiştê dike ku bavê wî sofî bûye û wekî “Sofî Mustefa” hatiye naskirin⁷⁰. Her wiha Xalid Sadînî di pirtûka xwe de çîrokek ji bo me vediguhêze ku behsa bûyerên di navbeyna Bateyî û sofîyên wê serdemê de ku qewimîne dike.⁷¹

Ew jî wê manayê dide ku Bateyî sofîyan naskiriye û têkilî di navbera wan de hebûye. Di hevpeyvîna navbera Bateyî û Girgaşî de eleqeyeke sofîyane tê dîtin. Di aliyekê din de Bateyî di mewlûda xwe de behsa du zanayên mezin ê îslamê dike ku ew jî, Şêxê Kerxî û Fexrê Razî ne. Eger li hember Bateyî de Fexrê razî sembola şerî'etê be, ewe Şêxê Kerxî li cem wî remza terîqetekê ye.

Hem ji şeyxan bû rîwayet ev xwber

*Şêxê kerxî fexrê razî ba dîger*⁷²

Herwiha Bateyî di nav helbestên xwe de peyvên wekî: “Sofî, Murşid, Salik, Şêx, Şahinşah” bikar anîne.

Şeyx û murîd û salikan

⁶⁹ Muhemmed Ebdurrehman Îbrahîm, *Îşq Lay Melay Cizîrî û Hafîzî Şîrazî*, Teza Lîsansa Bilind, Zankoya Silahedîn Kolîja Adab, Hewlêr 2004, r. 48.

⁷⁰ Doskî, *b.n.b.*, r. 19 .

⁷¹ Sadînî *b.n.b.*, r. 43 .

⁷² Şemrexî, *b.n.b.*, r. 12.

Şah û feqîr û malikan

Cust û çeleng û çapikan

Dil kete bendê payê zulf (p.x, r. 138)

Lêbelê Bateyî wekî rêber û şêx xwe nedaye naskirin. Lê nêrîna min ew e ku rêber û dilber û murşîdê Bateyî bi tenê Pêxemberê Xwedê ye.

Kovana min muhemmed e

Ji bo roja qiyamet e (p.x, r. 73)

4.1. Di Helbestên Bateyî de Edebiyata Tesewifê

Tesewif bi wê nesekînî ye ku bi tinê di çarçove û qaneqayan de bimîne, belkî pelî ji bo edeb jî kêşawe, bi taybet helbest, çünke gelek hevbeşî di navbera sofî û helbestvanan de heye. Mînak: soz, hest, endêşe, dildarî. Her ji ber wê yekê jî peywendiyê zexm di navbera sofî û helbestvanan de peyda bûye. Ta wisa lêhat helbest bûye keresteyê sereke ji bo derbirin û nîşandana bîr û baweriyên sofîyan. Helbestên sofîyan bi zimanê taybet bûye, gelek caran bi xwe jî di zimanê xwe jî fam nekirine. Ew jî bi sedema wan remz û îşaretan bûne ku wan di helbestên xwe de bikar anîne. Ji ber vê yekê edebiyata sofîgeriyê cuda ye ji edebiyata halbestvanên din. “Mey, meyxane, mestbûn” ji aliyê xelkî wateyek digeyne, lê li aliyê sofîyan wateyek taybet heye⁷³. Peyv û edebiyata sofîgeriyê di nav helbestên Bateyî de bi şêwazeke zelal û aşîkar diyar in. Ew jî di nav helbestên “ ey dilo migêniya min hat, ger tu nazik sorgul î , qismet ji dîwana ezel, el wefa bê wesl û canan, berhevdana wî û girgaşî” wî de reng vedane.

Bi piranî em dikarin bêjin ku wî di nav helbestên xwe de wan peyvên edebiyata sofîgeriyê bikar anîne. “Şah, Geda, Sofî, Dilber, Aşîq, Serxweş, Sekran, Mest, Hal, Sail, Perwane, Elem, Nar, Mehibbet, Sebir, Sekînet, Hebîb, Tecella, Sîrr, Qelib, Ehlî Îman, Can, Evîn, Wîsal, Şefa'et, Ehlî Sidiq, Miskîn, Fîraq, Mirşîd, Qeyd, Zincîr, Wesil, Dîwane, Saqî, Mey, 'Eded, Tas, Xemir, Mexmûr, Dawet, Bade, Tenbûr, Çeng, Ney, Şerab, Kemançe, Êd, Mûnîs, Meclis, Sultan, Mest, Meyfiroş, Meyxane, Hebîbê Qelb, 'Eta, Ehsan, Cûd, Saxa, Nexme Saz, Piyale, Cismanî,

⁷³ Xurşîd Reşîd, “Sofiyetî Di Şî'rên Kurdî De” *Kovara Beyan*, J. 65, Hewlêr 1980, r. 7.

Xelwet, Reqîb, Govend, Fincan, Bit û Lat, Meynoş, Lahût, Nasût, Remz, Cazib, Xal, Dêm, Fanî, Neqîş, Têmsal, Mensûr, Qûleyê Meyxane, Namûs, Nar, Nûr, Def, Nay, Reqîs, Helqe”.

4.2. Di Helbestên Bateyî de Remz û Babetên Tesewifê

Remz di ferhengê de bi wateya nîşane (sembol) tê⁷⁴, yan jî haydarîkirina xelkê ye ji bo dîtina tiştan. Remzên tesewifê ku bi piranî helbestvanên mutesewif bikar anîne ev in: remza jinê, remza meyê, remza sirûştêm.⁷⁵ Ji bilî van remzan gelek remzên din bikar anîne. Mînak: hejmar, tîp, dîrok û hwd.⁷⁶ Tefsîr û şirovekirina van remzan hatine diyarkirin û kes nikare bi sere xwe van peyvan şirove bike.

Wekî mînak:

1. Adem: Cemkirina nav û sifetên Xwedê ye
2. Îfîhad: Yekgirtina wicûd e digel heqê mutleq
3. Bade: Destpêka îşqê ye
4. Badefiroş: Mûrşîd û şêx e
5. Baran: Hatina rehmetê ye
6. Berq: Nûra Xwedê ye
7. Batil: Ji bilî Xwedê her tişt
8. Bûstan: Cihê xwe vedîtinê
9. Maç: Amadebûna ji bo qebûlkirina her tişteki
10. Bêhoş: Meqamê tiwanewe
11. Cam: Wesîleya nasîna Xwedê

⁷⁴ Nafi' Akireyî, “Remzên Sofîgerî di Helbestên Kurdî ya Kîlasîk-Behdînan” *Kovara Beyan*, J. 79, Hewlêr 1982, r. 27.

⁷⁵ Akireyî, *b.n.b.*, r. 36.

⁷⁶ Akireyî, *b.n.b.*, r. 27.

12. Cûr'e: Meqamên salike
13. Dildar: Paqijbûna rûh e
14. Sefer: Çûna dil e ji bo riya heq
15. Mast: Haletê bêhişî û nezaniyê
16. Şerab: Hateta îşq û evîndariyê ye
17. Yar: Sifetên Xwedê ye⁷⁷

4.2.1. Tebî'et (Sirûşt)

Di nava edebiyata tesewifê de giringiyeke wê ya pir heye; lewra soft ciwaniya me'şûq di nava tebî'etê de dibîne. Her ji ber vê yekê ye ku gul û gulzarên nav baxan; giyandarên nav daristanan; av, çavkanî û rûbar, behseke serekî ne di nav helbestên tesewifê de.

Ew çi dême şahebax e gulşena derul qerar

Sed hezaran nal û awaz ê di bulbul çar kenar

Helqe pê da bes tu hatin 'eqreb û îlan û mar

Nêrgiza şehla şepal î asemîna mêrxûzar

Lebxemoşî meyfiroşî dêmpeyala kê yî tu (p.x, r. 103)

Gelo bîşenge yan 'e 'er

Gelo yan misk e yan 'enber

Şepala nazika esmer

Bi xilxal û selasil hat (p.x, r. 107)

4.2.2. Evîn (Î'şq)

⁷⁷ Akireyî, b.n.b.,r. 41 - 42.

Evîn û hezkirin Gelek caran ev helwest ji kesayetî digihêjine rewşeke îlahî û hunera tesewufî derdikeve hole. li gor ramanên helbestvanên tesewufî, di bin binyada afirandina xwedê de hezkirin diraze. Melayê Bateyî jî ev teşeya helbestê bi hostayî bi kar aniyê û bi zimanê Kurdî jî xemilandiyê. Wî di helbestên xwe de him ziman him jî helwestên xwe bi hostayîyeke mezin nivîsandine.⁷⁸

Ji bextê min reşî rabû

Xiyala min ne batil hat

Li min roja xem ava bû

Siyehzulfê miqabil hat (p.x, r. 107)

Bateyî, di vê çarîneyê de sedema hemû xweşiyên xwe yara xwe dibine û yara xwe wekî navê siyehzulf hildide⁷⁹.

Aşiqê zulfa reş im

Aşiqê şeyda ye zulf

Bê bade lew sexweş im

Serxweşê şeyda ye zulf (p.x, r. 113)

Di edebiyata klasîk de bi gelemperî evîndar ji sakiye badeyê (eraq) dixwaze ku bi evîna xwe serxweş bibe. Lê belê Bateyî hingî evîndar e, bêbade serxweş dibe ango bandora yara wî ya li ser ramanên wî gelekî dijwar e⁸⁰.

Ger tu nazik sorgul î

Ez bilbilê metane me

Horiya reş kakul î

Ez aşiqê dîwane me (p.x, r. 131)

⁷⁸ Reşit Yıldız, "Di Helbestên Melayê Bateyî de Evîn û Hezkirin" *Bingol Üniversitesi, Yaşayan Diller Enstitüsü Dergisi Kürt Dili ve Edebiyatı*, Yıl 1, Cilt1, Sayı 2, Bingol 2015, r. 187.

⁷⁹ Yıldız, *b.n.b.*, r. 188.

⁸⁰ Yıldız, *b.n.b.*, r. 189.

Di vê çarîneyê de jî Bateyî her du hêmanên tesewufî *gul û bilbilê* bi kar tîne. Heger tu guleke sor bî, ez jî bilbilekî ku ji ber evîna te serxweş im. Heger tu horiyeke biskên wê reş bî, ez jî evîndarê te yê mîna yekî bi çol û çiyayan ketiye me ango dîwane me.⁸¹

Bê mey û bê dewayekî

Bê def û ceng û nayekî

Dîn diketin Melayekî

Cezbeyê dilrûbayê zulf (p.x, r. 138)

Bateyî di vê çarîneya xwe de ji derdê evîne kêfxweşiyên xwe anîne zimên û pesnê yara xwe vedaye. Biskên te ewqas bala mirov dikîşîne ku melayek derman û eraqê venexwe jî serxweş dibe. Tu def, ney û çengê lînexê jî ew mela ji rê derdikeve. Lewre biskên te dilê mirovan dixapînin.⁸²

Li min da tîrekê dijwar

Serî lê ket di dil çû xar

Daîma ez dikim hawar

Wekî mecnûn bi deştê de (p.x, r. 149)

Di vê çarîneyê de Bateyî xwe wekî *Mecnun* dibîne û evîna xwe ji ya *Mecnun* nizimtir nahesibîne. Behsa yara xwe dike û dibêje: ‘Te li min da tîreke dijwar, ew tîr di dile min de çû xwar.’ Ez her tim mîna *Mecnun* li deştan dikim hewar.⁸³

⁸¹ Yıldız, *b.n.b.*, r. 190.

⁸² Yıldız, *b.n.b.*, r. 190.

⁸³ Yıldız, *b.n.b.*, r. 191.

4.2.3. Mey ('Eraq)

Mey tişteke e ku bi sedema wî roşnayî û me'na li ber çavê salik aşkere dibe. Meyxane cihê xwe vedîtinê ye ku saqî (mûrşîd) mey didesofîyan heta ew mest dibin⁸⁴. Bateyî bi tasek ji xemreke sasef û bê xekekl, heta roja mirinê serxweş dibe.

Qismet ji dîwana ezel

Mey da me saqî yek 'eded

Tasek ji xemra bê xelet

Ez kirme mexmûrê edeb (p.x, r. 111)

Tasek ji xemra muhbetê

Da me di koşa suhbetê

Îname çerxê dawetê

Îşqê li min sotî kebed (p.x, r. 111)

Mey li nik bateyî dermana derdane û şîfa bo nexoşan dîne.

Kenî û gote: batey

Camekê min tijî mey

Mey nexweşan dikit hey

Ew çiyê çî dê bizan? (p.x, r. 123)

4.2.4. Zulf

"Zulf" peyveke Erebî ye ku binyada wî ji "Zulef" hetîye. Ku di Farisî û Kurdî de Zulf bi sikûna lam tê xwendin. Wateya Zulf li aliyê Sofîyan bi gelek wateyên

⁸⁴ Akireyî, , *b.n.b.*, r. 41.

cuda hatine bikaranîn, bi wateya beşek ji şev tê, her wiha peyveke mecaz e ji bo tarîfî û reşatiyê, bi wateya gêj bûn û riya hevraz û nişîv tê, gelek caran bi wateya (tecelî) tê, wate derketina ciwaniya me'şûqa ezêlî. Her wiha gelek caran bi wateya rêgir tê, ku rêgirî dike li rûyê 'aşîq heta me'şûq wî nebîne, her ji ber wê yekê ye ku sofî hez ji zulfan nakin.⁸⁵

Wek çawa Feqiyê Teyran pirr ji peyva dilber hez kiribe û ew di helbestên xwe de pirr bi karanîbe, Melayê Bateyî jî pirr ji peyva zulfê hez kiriye û ew di helbestên xwe de pirr bi kar aniyê. Ji ber vê hezkirinê ye ku wî navê keçike xwe kiriye "zulf".⁸⁶ Helbestên wî yên ku herî pirr peyva "zulf"ê di wan de derbas dibe helbestên bi navê "Aşîqê zulfa reş im" û "Ey di leger" û "Ey dilê qelb" in.

Aşîqê zulfa reş im

Aşîqê şeyda ye zulf

Bê bade lew serxweş im

Serxweşê şeyda ye zulf (p.x, r. 113)

Zulf baqek porrê dirêj ê kêleka serê mirovî ye. Di bateyî de zulf sembola evînê ye û tiştêkî pirr êşdar e. Ji ber ku evîn têgeheke êşdar e bateyî ji ber dirûvê zulfê yê reş û dirêj ew hertim şibhandiye maran û wî qala jehra zulfan kiriye.⁸⁷

Siyehzulfê ku peyda bû

Ji rojê nûra hinda bû

Ecêb nûrek li min dabû

Heta şehmarê qatil hat (p.x, r. 107)

⁸⁵ Muhammed Abdurrehman Îbrahîm, *b.n.b.*, r. 166

⁸⁶ Rênas Jiyan, *b.n.b.*, r. 11.

⁸⁷ Rênas Jiyan, *b.n.b.*, r. 12.

Bateyî, biskên reş û rast yên yara xwe wekî marekî reş dibîne û dibeje wan biskên reş ji ber evîna te, ez kirime êxsîrê xwe. Ku kesek dil dikeve biskên kesekê, dibe evîndarê porê reş. Ango sedema evîndariyê bi piranî di bin bandora porê reş de ye⁸⁸ dibêje:

Silsile zulfa siyeh

Efa û marî kereh

Qeyd kirime bêguneh

Ferman û tuxra ye zulf (p.x, r. 107)

4.2.5. **Dinya**

Bateyî mîna helbestvanên din ên klasîk behsa dinyayê jî kiriye. Li aliyê wî dinya ciheke xweş e; mîna, bûkekê ye, lê dilê wî req e, wate xweşiya mirov dilê xwe bide dinyayê.

Dinya çi xweş dinya ye

Temaşayê bibînin

Erûsa dilreqa ye

Seraser têk şîrînin

Heyfa ku bê beqa ye

Esla bo kes namînin (p.x, r. 56)

Li aliyê din dinyayê wekî kesekî bêwefa dide naskirin, her çiqas mirov bişibe li rûyê dinyayê, lê ew her dûr dikeve û xem û êş dide mirov, dinya wefadarî ji bo pêxember nebûye dê çawa ji bo mirovan wefadar be. Lazim e mirov berê xwe bide qiyametê û piştî xwe jî bide dinyayê.

⁸⁸ Yıldız, *b.n.b.*, r. 189.

Minak:

Dinya eyamek bê wefa

Hem mihnet û cewr û cefa

Lew ew nema bo mustefa

Ez dê ji kê gazinde kem (p.x, r. 75)



BEŞA DUYEM

JI ALIYÊ RUXSARÊ VE HELBESTÊN MELYÊ BATEYÎ

1. ZIMANA HELBESTÊ

Gava mirov baş honraweyên bateyî dixwîne lê dinihêre dibîne ku Melê di honraweyên xwe de çiqas li tesewif, dîn, rewanbêjî yê fikiriye, ewqas jî bala xwe daye ser rewaniya ziman û xweşbêjiya wî. Wî digel bikaranîna gelek gotin û hevokên biyanî jî ku bi rastî wan jî zahf bi şarezayî xebitandiyê, zimanê kurdî çî ji hêla rêzimanî ve û çî jî ji hêla avakirinê ve be hostatiyeke pir bi rêkûpêk bi kar aniye. M. Xalid Sadîni dibêje: zimanê melayî bateyî xweşxwîn, rehet û asane. Herwekî di gekek helbestên wî de dihête dîtin zimanekî gelêrî ye. Wekî helbesta "ji çîrya paşî û pêda " bi sedan salan e li ser zardevê xelkê me ye û bi hezaran însanan ev helbesta ji ber e. her wisa helbestên wî " hilo rabe edul qasim û muhemmed seyyidê 'alem " jî, di medresên kurdistanê de li ser devê xwendevan û feqeyên medresê ne. ji xwe mewlida pîroz ya wî di nav gelê me tete xwendin.⁸⁹

Her wekî ji berhamê bateyî yên heta niha bi destê me ketine diyar e ku ew ji bilî kurdiyeka baş "Erebî û Farisî û Tirkî " jî dizane. Di hemahîlkên wî (du'ayên erebî) pêşekiya wan jî bi farisî ye.⁹⁰ Ji peyvên nav helbestên wî de kifş e ku bi tirkî jî dizanî.

1.1. Peyvên Kurdî Yên Resen Di Helbestên Bateyî Da

Peyv ji hêmana zimanî ye herî biçûk û watedar re tete gotin.⁹¹ Bateyî hem gotinên zaravayên kurdî di şî'rên xwe de bi kar aniye û hem jî ji gelek devokên kurmançî pir nimûne dane. Ji ber wê yekê di nav helbestên bateyî de zehf Peyvên kurdî yên resen hene û ji bo me hatiye parastin.

Wekî mînak ji aliyê sazûnê ve:

⁸⁹ Sadîni, *b.n.b.*, r. 37 .

⁹⁰ Sadîni, *b.n.b.*, r. 32 .

⁹¹ Nezîr Ocak, *Waneyên Rêzimana Kurmançî*, Weş. Sîtav, Ç. Yekemîn, Wan 2014, r. 45.

1.1.1. Peyvên Xwerû

Nizm , bilind , çem , çûn , çend , pa, reng, deng, nivêj, dirêj, endam, sûtç, nav , jar, berîn, şîrîn, ax, tarî , yar , xirab , şol , mîr, pir, dûr , rah, mêr , laq, per, qenc , rêz , nêzîk , jin , roj , şer , sar , pîr , kal , mal , baran , şox , zer , berze , mezin , direw , bawer, gêj , rûbar, req, hisar, heval, garan, spî, şeker, çav, pêrar, , seher, çira, tîr, cerg, birîn, av , xwîn, xirab, zar, giryan, hewar, kul, kovan, jan, asiman, nalîn, bext, zêde, durr, şivan , nêrgiz, gerim, toz, pez , garden, çîmen, ask, behest, mar, bilbil, şepal, saz, çeng, mey , xene , guhar, berben, bazin, xedeng, têt, perçem, toq, xilxal, werdek , qaz , sî , şerbet, delal, naz, bejin, çogan, çelek, mû, mil, bişkiwt, tijî ,geş, ru, dev , lêv , xûnçe, zivistan, zozan, solîn, perêşan, jor, zerî, seyran, tarî, kolan, serma, êxsîr, nêşîr, geş, sipîndar, hejyan, tirs,berf, bûman, şîr, aloz, doz, nazik , nîgar, xencer, kezî, dijwar, biçûk, dîn , têt, xuya,îro, toz , ba, reng.

1.1.2. Peyvên Nexwerû

çêkir , seraser, neyar , newar , nabît , kê m û kas, buxtankir, bedguman, çêkir , bêînsafî, kê m kê m, pêxas, serkol, neçe , şorguhar, rûspî , bê tam , keç û bed , wefadar , pîrbêj, bê rêz , nekernivêj, rûreş, namdar, bê tam , bê rey û tekbîr, mîrser, nezanî, nakes, xweser, dilkeser, jê r û jûr, dilber , bê biha, dûredest, serxweş, naçar, agehdar, dergah, rûh û can ,êş û jan, derd û bela, bêwefa, bêniyaz, hûrbûn, nigûnser, têtav, pirtav, sef bi sef, mizgênî, bir bi bir, qetre bi qetre, çavxezal, ebrûzirav, reşrihan, meyfiroş, dêmpeyal, gulnîgar, derd û dax, xemkûsar, bê çemen, bê biha, tar û mar, dem bi dem , pîrfiroş, der be der, dîlnîgar, şil û mil, gulbav, ta ta,têlo têlo , hey hey , wey wey , çîn çîn , ref ref , laşspî, bêhnxeş, zenexsêv, mihr û wefa,dev û lêv, nexweş , şînbû, sir û serma , serdar, şeb û roj, şimşîr, xizmetguzar, giran beha, xemz û naz, sîma perî, ta bi ta, bit û lat , xet û xal , mey xane , giran beha , sorgul, kunkirin, agirhîlbûn,çêtir, şîrîntir .

Mînak:

Sofî bi çeng û per bît

Dûr e ji rahê usûl

Mêrê bê laq û kef bît

Kê m kê m ji ber diçin şol (p.x, r. 58)

Buxtankir û bedguman
Herdu çêkir ji kafî
Heyf e ku mîrû sultan
Pir biken bêînsafî (p.x, r. 57)

Bo kes pêwebde naket
Ji dest ehda neyarî
Heyf e kozî fena ket
Lawê ber ji xwe nexarî
Xûban di axê raket
Siyahzulfê di tarî (p.x, r. 57)

Tu bi navê xwe yî rehman
Tu bi heq sih cuzyê quran
(Bateyê jar) tu bi xufra
Tu xeffarê xeta yî (p.x, r. 55)

1.2. Bandora Erebi

Di helbestên Melaye Bateyî de bandora erebî gelek zêde hene. wî peyv û terkîb û hevokên erebî zehf bi kar anîne. Carînan riste bitevayî bi erebî ne carna jî piraniya risteyê bi erebî ye. Ew jî bi sedema wî bûye ku xwendina wî di medrese yê de bi erebî bûye.

1.2.1. Peyvên Erebi

Di helbestên Melaye Bateyî de gelek peyvên Erebi hatine bikaranîn: ezel , seqf , sema, hukm , erş , kursî, alem, lutf , hey, ferd, hemd, sena, yed, refîq, şerîk, dehr,wekîl, delîl , lewn , ferz, rûh , dewa , cins, missal , ehmeq , tîn , defter , cesed , zat , qedîm , sebî , rizq, xerîb , hebîb , tebîb , qewm , sir , nedîm , şewq , zenb, şems , meden, sidq, cûd, Behr, kerem, nesîb, reb, newm .

Mînak:

Ya reb bikey tu bi nesîb
Tecelliya husna hebîb
Derman bikey dilê xerîb
Ya reb tuyî dermanê min (p.x, r. 71)

Kan me'dena sidq û sefa
Kan 'etaye cûd û sexa
Behra kerem kanê wefa
Kanê muhemmed mustefa (p.x, r. 134)

Ye îlahî ez xerîb im
Daîma her dil kebîb im
Bê hebîb û bê tebîb im
Xam di nav qewmê xerîb (p.x, r. 68)

1.2.2. Navên Pirjimar

Ekber ,eqlam, mensûx ,esbab , mulxat, bewab , kufar , mîsal , xusran , ewtan, ehsan , esrar .

Xudanê wehy û tenzîlê
Bi eqlam û bi tebcîlê
Qelem da nesxê încîlê
Nema tewrat di xeclanê (p.x, r. 83)

Çi încîl û çi tewrat in
Di mensûx û di mulxat in (p.x, r. 83)

'Alimê esrar û bal, muhewwilê kull û hal
Sirra te ye min xeyal şewqa te ye min nedîm (p.x, r. 76)

1.2.3. Hevok û Terkîbên Erebi

Di helbestên Melaye Bateyî de hevok û terkîbên erebî gelek hene : hebîbullah , terehum ya nebiyullah, laubalî , darul qerar, şukurullah , feteala , ya reb, muhewwilê kull û hal, min fedlîke ya kerîm, ela ya eyyûhes-saqî, ezmê remîm, tehtessera, lamekan , emîrunel zeman , ebul deqîq , Sumestewa eleterîq, emîrunel bewab, zad el kerar, seful kufar.

*Kanê gelo **ebul deqîq***

*Sumestewa '**eleterîq***

Kanê ebû bekrê sidîq

Kanê muhemmed mustefa (p.x, r. 135)

*Kanê gelo **zad el kerar***

*Kan fatihê **seful kufar***

Kanê eliyê namidar

Kanê muhemmed mustefa (p.x, r. 136)

Ela ya eyyûhes-saqî

Xudanê ehd û mîsaqî (p.x, r. 91)

Şewqa sirrê reşandê

Mirin bibêt li caddê

Dixwazim ez muradê

Min fedlîke ya kerîm (p.x, r. 76)

La hewla la quwwete illa bîllahîl ezîm

La seyre la seknete illa bike ya elîm (p.x, r. 76)

Batey tu bike bê xem

Digel sirra xwe mehrem

Wexfîr lî zenbî werhem

Entel xefûr-ur rehîm (p.x, r. 77)

Ey lelê lebit ezmê remîmî diket ehya
Ber şewqa rûyê te sergeşte sureyya
Cûşan û xurûşan ji fîraqa te ne derya
Herçî ku bi şer'a te 'emeldar in di dinya
Kanet lehum el xuldû herîren we serîra
Ursîlte îlel xelqî beşîren we nezîra (p.x, r. 81)

1.3. Bandora Farisî

Di helbestên bateyî de peyvên farisî ew e : Afîtab, aşina, bîş, came, dehen, dîde, meh, xab , nîgarende , nimanende, bexşinde, xûb , siyah, noşmende, çirax, perwane, ustad, baxban, merd, darinde, sazende, lewleb, keywan, enguşter, der kûş , dîger, hemnişîn, mahitab, merg, Xwedawend, spihr, gazinde , şermende, ateqûdaz, nemaz, pertew, şikuft , bax , firyad, zeban , rehber , mehderçe , niqabpoş , mehder , lebxemûş, xah , xedeng ,rehnima, şermende, berguzer, şah, şahebax, xemkucar, ateq , şehriyar , subh,dîwane, badenoş, çi mîxwahî , fixan , goş , guhar , bîmar , yelda , deycûr , çeşim, xûbrû , ayîne, hemçû , duxan , xedeng, şebistan, çengil, mest, aftar , perwaz, ejdîha, cilwe, tûle, firyadres. Ji xeynî van peyvan Bateyî daçeka (Ez) ku tê wateya “Ji” daçeka (der) ku tê wateya (li) jî zehf bi kar aniye:

“Ez û der û ber” ku tê wateya “Ji” jî zehf bi kar aniye:

Eqreb û reşmarêd reş
Ser keç û bîmare geş
Zulmetiya horîweş
Leylê di yeldaye zulf (p.x, r. 114)

Ez im sail li dergahî
Ne go: ebdal çi mîxahî
Ji min qet nîn e agahî
Fîxan û ahê bilbil hat (p.x, r .109)

Nîqab û perdeyan bavê

Li mehcûran dem û gave
Bi rehmet lê bike avê
*Şefaet ke ji bo **mehder** (p.x, r. 90)*

Me can bade fîdayê te
***Tenem** xake sereyê te*
***Zeban** weqfa senayê te*
Dilê min 'ebdî fermanê (p.x, r. 87)

Muhemmed seyyîdê alam
Şefîe roja mîzanî
Çiraxê dîdeyê adem
Xwedanê wehy û furqanî (p.x, r. 83)

*Bi ahê **ateşgudaz***
*Bi sêzde ruknê **nemaz** (p.x, r. 77)*

Min dî vebûn dergah û der
Ê têkelî bangê seher
(Der kûş hûş im şud xeber)
Batey bixwaze metlebê (p.x, r. 67)

Xeffarî xweş sûltanî tu
Xellaqê rûh û can î tu
Darindeyê keywan î tu
Sazendeyê neh lewleb î (p.x, r. 66)

Taha tu resûlê melikê erşê ezîm î
***(Der)** behrê cemalê tu tenê durra yetîm î*
*Ehsentirî **ez** yûsifê siddîq û helîm î*
Lu'lû sifetî der sedefê behra kerîm î (p.x, r. 80)

1.4. Bandora Tirkî

Bateyî, di hin xaneyan de peyvên tirkî jî bi kar anîne. M.Xalid Sadînî dibêje: Melayê bateyî di gelek helbestên xwe de gelek peyvên ku di ser zimanê tirkî re ketine zimanê kurdî bi kar anîne, wekî: Qirmiz, çifte, yol, îlan, eslan, tabur, qumaş, yaban. Kesê helbestên Bateyî bixwîne, dibîne ku zêde peyvên tirkî tê de hene.⁹²

Minak: ocak, al, çifte, yol, îlan, eslan, tabur, qumaş, yaban, bolûk, çengal, toq, çiçek.

Benî sultan û şirîne

Xwdanê yol û temkîne

Qumaşê çîn û maçîne

Ji sundûqan deranîne (p.x, r. 118)

Çiçeka Baxê îrem şûx bejn û bala kê yî tu

Bo Xwedê key bêje min kanê şepala kê yî tu (p.x, r. 102)

Ey hebîbe min Muhemmed ey delal

Bêje da rûhnik ne barin bo te al (p.x, r. 209)

1.5. Peyv li Aliyê Wateyî Ve

1.5.1. Peyvên Dijwate

Ji wê hunera wêjeyî ya ku di risteyê yan jî di malikan de ji aliyê wateyê ve du peyvên dijwateyî bi hev re tên bikaranîn re tê gotin.⁹³

Mînak:

Ya reb tu yî ji nûrî tu

Sultanê jêr û jûr î tu (p.x, r. 66)

⁹² Sadînî, *b.n.b.*, r. 27.

⁹³ 'Ezîz Gerdî, *Rewanbêjî di Edebyata Kurdî de*, B. Duyem, Weş. Şarewanî, Hewlêr 1975, r. 68.

Şêx û sebî her middetê

Ew razîqe rizqê detê (p.x, r. 66)

Bi giryan im şeb û rojê

Disojim agirê dojê (p.x, r. 128)

Bedra ji wê behrê mudam

Qetre bi qetre wek riham

Bigre li ser me xas û am

Xerq bûm di îhsana te da (p.x, r. 97)

Sed qenciyan bi gel key

Nabîte dost ne duşmin (p.x, r. 61)

Tu ne nizmî ne bilind î

Tu ne çûn î û ne çend î

Tu munezzeh ji du zend î

Tu muqeddes ji yed û pay î (p.x, r. 53)

1.5.2. Peyvên Hemwate

Ew cure peyv in ku ji aliyê wateyê ve wekî hev in.⁹⁴ Wate dirûv cuda ye lê wate yeke. Di helbestên bateyî de peyvên hemwate gelek hene, ew jî bi sedeema ew e ku kurdî zimanekî pir devokî û pir zaraveyî ye.

Mînak:

Gote me ya xûbrû

Tiştekê min mislê mû

Çapuk û çust û hem çû

Ew çi ye çi dê bizan? (p.x, r. 120)

⁹⁴ Ocak, *b.n.b.*, r. 49.

Niqab û perdeyan bavê
Li mehcûran dem û gave (p.x, r. 90)

Te hey kirin ev rûh û can
Derd û bela her êş û jan (p.x, r. 74)

Ez feqîr im dûredest im
Serxweş û sekran û mest im (p.x, r. 69)

Ez feqîrim bê biha me
Rûreş im hem rûsiya me (p.x, r. 68)

Kerem û rehm û emîm e
Semeda ez qet çûnîm e
Ezê tawî me ketî me
Tu xo derman û dewa yî (p.x, r. 55)

Guneh û sûç û şuweş î
Mekirne taetî keşî (p.x, r. 55)

Semed û heyyul mecîd î
Qurbetê (heblul werîd) î
Ehed û ferd û hemîd î
Layiqê hemd û senay î (p.x, r. 53)

1.5.3. Peyvên Hevdeng û Hevrenng

Ew cure peyv in ku dirûv anku tîpên wan wekî hev in, lê wate ye wan ji hev cuda ne.⁹⁵

Mînak:

Ji şerqê roj ku hate der
Dinê pêk ve bûye enwer

⁹⁵ Ocak, *b.n.b.*, r. 50.

*Bibînit **dilbera dilber***

Muferreh bûm di gel wê de (p.x, r. 174)

dilber (navê yar) **dilber** (ew kes ku dilan dibatin) .

*Qewlê wî da xafil **nebî***

Heta tenefus dê hebî

*Sellû 'ela rûhul **nebî***

Kanê muhemmed mustefa (p.x, r. 136)

Nebî (lêker ê nekirinê ye) nebî (pêxember).

*Tali'ê bext ger **me dedî***

Dewlet sera amed me dî

*Dil ku xwe da bi **mededî***

Ceng û perê hewayê zulf (p.x, r. 140)

Mededî (lêker ê bînînê yê) mededî (xwe bidiye cem wî (penehê wî)).

1.5.4. Cote Peyv

Ji bo ku vegotin xurttir bibe du peyv tên bal hevdu û dibin cotepeyv. Di axaftina rojane de ji bo ku axaftin bihêz be ev cure peyv tên bikaranîn. Dikarin bi alîkariya gihanek û navbendan bikevin şiklên nû an jî carna di navbera herdu bêjeyan de bi xêzekekê jî ev bêje bînan bikaranîn û vegotinê.⁹⁶

Mînak:

Lif û rîşî û şetrî tên

*Bi **çîn çîn** taze xemrî tên*

Ji baxê taze qumrî tên

*Bi **ref ref** werdek û sîn e* (p.x, r. 119)

*Ji du zulfan **hey hey***

*Ji du xalan **wey wey*** (p.x, r. 117)

⁹⁶ Bahoz Baran, *Rêzimana Kurmancî*, Weş. Belkî, Stenbol 2012, r. 39.

Çeng û neyê û silsil e
Turkî dibên kakul e (p.x, r. 114)

Leylêd deycûr e ho
Têlo têlo hûr e ho (p.x, r. 114)

Ev e ew Ehmedê nadir
*Wan **bir bi bir** ziyaret kir* (p.x, r. 94)

Wekû nebî hatî lef
*Melek rabûne **sef bi sef*** (p.x, r. 93)

Çi şehmarin xena pencê
Tilismê wî li ser gencê
Dilo rabe bibîn qencê
*Çi bîşenga **şil û mil** hat* (p.x, r. 107)

Mêrê bê laq û kef bît
Kêm kêm *ji ber diçin şol* (p.x, r. 58)

*Te hey kirin ev **rûh û can***
Derd û bela *her êş û jan* (p.x, r. 74)

1.6. Navê Cih û Welat û Kesayetiyên

Melayê bateyî di helbestên xwe de navê gelek ceh û welat û kesayetiyên dîrokî behis kiriye. Ewe jî ew e nîşana me dide ku bateyî Xwedanê rewşenbîriyeka cur bi cur û berfireh bûye.

1.6.1. Navên Kesayetiyên

Nebî Muhammed, Nebî Suleyman, Nebî Îbrahîm, Nebî Îdrîs, Nebî hûd, Nebî Mûsa, Nebî Îsmâîl, Nebî Îsa, Loqman , Nebî Dawûd , Adem, Nebî Yûsuf, , Nebî Yaqûb , Nebî Şîs, Nebî Nûh, Ebûbekr, Ummer Binî Xetab, Usman Binî Efan, Elî Binî Ebûtalib, Şeyxê Kerxî , Fexrê Razî, Mela Mensûr, Macin ,Ednan , Haşim,

Qûsey, Ebdulmûtelîb, Ebdullah, Mîrî Şêrwan, Mîrî Mexmûrkan, amîne, Helîme tul Se'diye, Belqîs, Leyla, zuleyxa, Selwe , Hemail , zulfe , Asimîn, Mecnûn, Manî, Eflatûn , Calînûs , Kîsra, Nemrûd , Qarûn .

Mînak:

Kemerzalê me dê kî bin

Ji ahîne merhedî bin

*Meger **Loqman û Îsî** bin*

Nekêşit kes cefaya min (p.x, r. 162)

Şefeq da erd û esmanî

Li min dilber meha sanî

Dixûm sûndê bi tahayê

***Zuleyxa** bû di misrê da* (p.x, r. 145)

*Eger hekîm e **loqman** e*

***Dawûd** digel **suleyman** e* (p.x, r. 73)

*Sed wekî **îsa** û **eflatûn***

*Û **calînûsê** hekîm*

Çareyê ji derdê me nakin

***Bête ey loqmane** me* (p.x, r. 133)

1.6.2. Navê Cih û Welat û Miletan

Kurdistan, Çîn û Maçîn, Hind, Şam , Rom, Ecem, Behra Nîl, Ummul-Qura, Hîcaz , Hetîm, Yesrîb, Misr, Quds, Behra Qulzem, Hindistan, Baxê Îrem ,Wadiya Eymen, 'Eden , Deşta Tetar , Muks, Hekkarî, Diyarbekir, Hebeşe, Bexda, Tewrêz, Semerqand, Belx , Buxara, Ke'nan, Çîn , Çiya ye Tûr , Berçel, Heleb, Rewze , Medîne .

Bibînim ca wekî bayê

Şirîntir bû li leylayê

Nehin ev reng di bexdayê

Li tewrêz û di şamê da (p.x, r. 147)

Te çêkirin berr û bûm

Sivlaq çîn û maçîn

Hind û Ecem şam û Rom

Dinya koh û zemîn (p.x, r. 56)

Vê mehbûbê bi ser mestan

Celad îna ji kurdistan (p.x, r. 109)

Wekî min dît li govendê

Gelo ya reb tijî çendê

Neh in ev reng li Semerqendê

Di Belxê û Buxarê da (p.x, r. 148)

2. Wênê Şi'rî (Helbestê)

Diyarkirina zaravê Wênê şî'rê di boçûnên cuda de gelek biwêj bi xwe ve girtiye, mîna "Wênê şî'rê, wêna edebî, wêna hunerî". hunerê wênekêşana şî'rê ku niha bûye cihê bayexpêdana lêkolervanên cihanî, lêbelê Wênê şî'rê mîna mijarên din di nav edebyata kurdî de cih negirtiye. Wêne mîna hêvênêkî ye ji bo şî'rê, anku bi ramaneka din wêne rûh û canê helbestête.⁹⁷ (Sî. Dî. Liwîs) dibêje: "Wênê şî'rê di xwerûtirîn wateyê de, wênekêşaneke û binyatê wî peyve"⁹⁸ . I vî pênaseyê xûya dibe ku karê wênekêşê çêkirna wênekî bi rengaye, lê şî'r jî wêne di kêşe bi rêka ziman û amrazên zimanî. Wênê şî'rê çêkirna wênwyane bi peyvan⁹⁹. Ahsan 'ebas dibêje : "Wênê şî'rê dariştineka taybetî ye û cureyêke ji wênekêşanê, bi şertekî ya pir bît ji hest û sozên şa'îrî".¹⁰⁰ Wênê şî'rê bi karîna hunerê teşbih (lêkçiwandin) û Îstî'are (xwastin) diyar dibe¹⁰¹ .

Mînak:

Melayê bateyî di helbesta xwe "ji çirya paşê pê da" gelek wêneyên zozana berçelê insana me dide.

⁹⁷ Azad Edbul'ezîz Mizûrî, *Celadet Bedirxan û Şi'r*, Ç. Êkê, Weş. Sipîrêz, Dihok 2006, r. 54.

⁹⁸ Sî. Dî. Liwîs, *e-l Sure el -Şi'riye*, (W. Ehmed Niseyf el-Cenabî), Bexdad 1982, r. 21.

⁹⁹ Muhsin Qoçan, "Wênê Hozanê wek Awazekê Derbirînê" *Kovara Nûxazî*, J. 2, Dihok 1992, r.19.

¹⁰⁰ Ehsan 'Ebas, *Fen-ul Şi'r*, Ç. Sêyê, En-Naşir Dar el- Seqafe, Bêrût 2005, r.12.

¹⁰¹ Çinar Sidîq Xazî, *Arastên Teknikî di Şi'ra nû ya Kurdî de – Devera Badînan*, Ç. Êkê, Weş. Sipîrêz, Dihok 2008, r. 98.

*Zivistanê li vê yolê
Li vê beryê li vê çolê
Gerovî girtî daholê
Mijê havête zozanê (p.x, r. 124)*

*Gerovê girtî nesrîne
Cemed şîn bû li solîne
Gîrya me tê ji bo asmîme
Perîşan im ji talanî (p.x, r. 124)*

Dîsa dibêje:

*Zerî tîn û diyar nabin
Çi xweş tîn û sitar nabin
Çi cindî tîn siwar nabin
Bûye tarî li kolanê (p.x, r. 125)*

*Bûye tarî û zulmat e
Yeqîn kanûn tê de hat e
Sirr û serma ji nû hat e
Binêr daxê û kovanê (p.x, r. 125)*

di helbesta (bi dil îro xedengim ez) wêne ya xwe dikêşe û nîşana me dide û dibêje:

*Bi gîryan im şeb û rojê
Disohim agirê dojê
Ji eşqa xunçe bişkojê
Me nalê çû bû esmanan (p.x, r 128)*

di helbesta jêrî de wêneya zulfê dikêşe :

*Zincîr û tayê qenar
Ser daye goşê guhar
Pê da xweş hatine xwer
Şehmarê şehla ye zulf (p.x, r. 113)*

2.1. Manendin (Teşbîh)

Tiştêkî nediyar heye wateyê wî aşkera nîne, şa'îr tê ew tiştê nediyar bi tiştêkê din yê diyar dişûbhîne, taku wateye tiştê nediyar, diyar be. Di şibandineke berfireh de çar rêgez hene. Dido ji van rêgezan, rêgezên bingehîn in, manende (muşebbeh) , lêmanende (muşebbehulbih) , dido ji wan jî rêgezên alîkar in, hêla manendinê (wechê şebah),daçeka manendinê(edatê teşbîhê).¹⁰² Manendin dibe çar cur.

2.1.1. Manendina Rehya Dirêj (Mufessel)

Ew manendin e ku hemû hêmanên wê yên mînanandinê tîn bilêvkin.¹⁰³

Baranî çonî temed

Li ber te da bîr dayim

Sar e ji rengê cemed

Koxsareyê mulayim (p.x, r. 59)

baranî: manende, cemed: lêmanende, ji rengî: daçeka, sar: hêla manendinê ye

Şemala min şefeq se'dê

Dinalim şuphetî re'dê (p.x, r. 109)

Îm: manende, re'd: lêmanende, şuphetî: daçeka, Dinale: hêla manendinê ye

Şubhî Ye'qûbî ji 'işqa yûsufê gûlpîrehan

Mûnîsî derd û xeman im sakînê beytul hezen (p.x, r. 105)

Îm: manende, ye'qûb: lêmanende, şubhî: daçeka, Mûnîsî derd û xeman û sakînê beytul hezen: hêla manendinê ye

Li min da tîrka dijwar

Serê tîrê di dil çû xwar

Dê daîm ez dikim hawar

Wekî mecnûn di eşqê da (p.x, r. 149)

¹⁰² 'Elaedîn Sicadî, *Xoşxwanî*, Weş. Mi'arîf, Bexdad 1978, r. 44.

¹⁰³ Îdrîs Edbullah, *Layenî Rewanbêjî le Şî'irî Klasîkî Kurdî de*, Weş. Hacî Haşim, Hewlêr 2011, r. 123.

Ez: manende, mecnûn: lêmanende, wekî: Daçeke, hawar kirin: hêla manendinê ye.

2.1.2. Manendina Rehaya Puxt (Mucmel)

Ew manendin e ku digel manende û lêmanende daçeka manendinê jî tê bilêvkirin.¹⁰⁴

Ber û mil rastî bişkoj in
Cewahir tê wekî roj in
Di ber da xunce dilsoj in
'Ecaib baxê kamil hat (p.x, r. 108)

Cewahir: manende, roj: lêmanende, wekî: daçek e

Şemala min şefeq se'dê
Dinal im şûbhetî re'dê (p.x, r. 109)

Îm: manende, re'd - lêmanende, şûbhetî: daçek e

Min gote ya hemçû meh
Vêketim ez bê guneh (p.x, r. 122)

wê: manende, meh - lêmanende, hemçû: daçek e

2.1.3. Manendina Cextawa Dirêj (Muekked)

Ew manende ku daçeka manendinê nayê bilêvkirin, lê hêla wê tê bilêvkirin¹⁰⁵

Dinya çi xweş dinya ye
Temaşayê bibînin
Erûsa dilreqaye
Seraser têk şîrînin (p.x, r. 56)

dinya: manende, erûsa dilreq: lêmanende, şîrînin: hêla manendinê ye

¹⁰⁴ Îdrîs Edbullah, *b.n.b.*, r. 123 .

¹⁰⁵ Îdrîs Edbullah, *b.n.b.*, r. 123

Mutrikê bab û bira me

Sotiyê şem' û çira me (p.x, r. 68)

Ez: manende, şem' û çira: lêmanende, sotî: hêla manendinê ye.

2.1.4. Manendina Cextawa Puxt (Teşbîha Belîx)

De teşbîha belîx de tenê her du hêmanên bingehîn angî (manende û lêmanende) tên bilêvkin. ¹⁰⁶

Pez îna em xweş şivanî tu

Şivanê ûmmetê yekser (p.x, r. 90)

Em: manende, pez: lêmanende) (tu: manende, şivan: lêmanende ye

Emîrê textê 'uqbayê

Siha wî dara tûbay

Xwezî carek di dinyayê

Bidîta min tu wî anê (p.x, r. 85)

Siya wî: manende, dara tûbayê: lêmanende ye

Dilê bê 'işq û yar in

Çiraxê bê fetîl e (p.x, r. 62)

dilê bê yar: manende, çiraxê bê fetîl e: lêmanende

2.2. Îstîfare

Bingeha manendinê teşbih e. Di manendinê de bêjeyek bi rengê demdemî di şûna bêjeyêke din de tê bikaranîn. Di vê hunerê de ji du hêmanên bingehîn ên şibandinê yek tê bikaranîn. Angî di risteyê de yan hêmana manende yan jî hêmana lêmanende tê nivîsîn. Dema hêmana manendî hatibe nivîsîn ji wê re dibêjin “îstîfareya

¹⁰⁶ Îdrîs Edbullah, *b.n.b.*, r. 124 .

girtî” lê gava ku hêmana lêmanendî hatibe nivîsîn ji wê re jî dibêjin “îstîfareya vekirî”.¹⁰⁷

Refte gûrgek hate bexê nûciwan
Lê belê hişyar e lê zîba şivan (p.x, r. 186)

Refte gûrgek, îstîfareya vekirî) (berxê nûciwan, îstîfareya vekirî

Du zulfeyn her di aloz in
Qital û qetl û amoz in
Digel Batey xudan doz in
Xilas nabim ji kovanan. (p.x, r. 130)

Zulfên weke mirovên qatil in, îstîfareya girtî

Çi şehmarê xenapencê
Tilismê wî li ser gencê
Dib rabe bibin qencê
Çi bişeng e şil û mil hat. (p.x, r. 107)

Kakulên heskiriya xwe şibandiye şehmaran, îstîfareya vekirî

Nigûnser bûn senem 'aciz
Ji tewlîda gula qurmiz (p.x, r. 84)

Senem, îstîfareya girtî

2.3. Kînaye

Kînaye ew e ku mirov tîtek binvîse, lê meqseda wî tiştek din be. Peyvên ku kînayeyê saz dikin du wateyên wan hene. Yek ji wan wateya “rastî - ferhengî” û ya din jî wateya “mecazî” ye. Di vir de mebesta helbestkar wateya dûr e, ango ya mecazî ye.¹⁰⁸

Çi gul bû ew çi bilbil bû
Mirad û metleba dil bû

¹⁰⁷ Îdrîs Edbullah, *b.n.b.*, r. 184 .

¹⁰⁸ Îdrîs Edbullah, *b.n.b.*, r. 204 .

Eger çî ew j imin sil bû
Ji bo Batê Hemaîl hat (p.x, r. 110)

Hemaîl: 1. Navê xanima wî, 2. Nivîşt

Biçûkê 'işqa bedxwû me
Li ser teb'e xwe ez çûme
Li min 'amî nekin lûme
Ji dil gestim du eylanan. (p.x, r. 128)

Ji dil gestim: 1. Bi rastî ez gez kirime, 2. Ciyê ku gez kirine dilê min e

3. Kêşa Helbestên Bateyî

Weke ku em dizanin sisê cureyên keşê hene: Keşa 'erûzê ya kêteyî û ya serbest in. Lê di edebiyata Kurdiya klasîk de keşa sereke ya eruzê ye. Keşa 'erûzê li gor kêteyên kurt û yê dirêj tê hesibandin. Me, di jêr de kêteya dirêj bi vî awayî (-) û kêteya kin jî bi (+) nîşan daye. Di Dîwana Bateyî de bi tevahî 29 helbest hene ku hemû jî bi behrên erûzê hatine nivîsîn. Behra Hezec (11) Behra Remel (8) Behra Recez (6) Behra muzari' (1) Behra besît (2). Bateyî di helbesta xwe ya bi navê “Derd û Dax im” de ne li gor erûzê tevgeriyaye.

Helbestê : (Ji bextî min reşî rabû)

Ji bextî min reşî rabû
Xiyala min ne batil hat (p.x, r. 107)
+ - - - / + - - -
Mefa'ilun Mefa'ilan
(behra hezecê)

Helbestê: (qismet ji dîwane ezel)

Qismet ji dî wane ezel
Mey da me sa qî yek 'eded (p.x, r. 111)
- + - / - - + -
Mustef'ilun Mustef'ilun

(Behra recezê)

Helbestê: (aşiqê zulfa reşim)

Aşiqê zul fa reş im

Aşiqê şey da ye zulf (p.x, r. 113)

- + - - / - + -

Fa'ilatun fa'ilan

(Behra renelê)

Helbestê: (ji eltafa şehîñşahê (

Ji eltafa şehîñşahê

Di roja pêñ cşembî ne (p.x, r. 118)

+ - - - / + - - -

Mefa'ilun Mefa'ilun

(Behra hezecê)

Helbestê: (Ji çirya pasiyê pê da)

Ji çirya pa şiyê pê da

Melayê Ba teyê kanê (p.x, r. 124)

+ - - - / + - - -

Mefa'ilun Mefa'ilun

(behra hezecê)

Helbestê : (Muhemmed sahibê tacê)

Muhemmed sa hibê tacê

Çiraye cin n û insanî (p.x, r. 93)

+ - - - / + - - -

Mefa'ilun Mefa'ilun

(Behra hezecê)

Helbestê: (hilo rabe edul qasim)

Hilo rabe edul qasim

Hilo ey qa sidê ekber (p.x, r. 89)

+ - - - / + - - -

Mefa'ilun Mefa'ilun
(Behra hezecê)

Helbestê: (Muhemmed seyyîdê 'alem)

Muhemmed sey yîdê 'alem
Şefî'ê ro ja mîzanê (p.x, r. 83)
+ - - - / + - - -
Mefa'ilun Mefa'ilun
(Behra hezecê)

Helbestê: (Ecel saqî bi dest min da)

Ecel saqî bi dest min da
Meya baqî di peyalê da (p.x, r. 145)
+ - - - / + - - -
Mefa'ilun Mefa'ilun
(behra hezecê)

Helbestê : (La hewle la quwwete)

La hewle la quwwete
Îlla bîllah îl 'ezîm (p.x, r. 76)
muftê'ilun fa'ilan
- + + - / - + -
(behra besîtê)

Helbestê : (Msetê şepelê teftêş)

Msetê şepe lê teftêş
Kir ji me go dê bizan
muftê'ilun fa'ilan
- + + - / - + -
(Behra besîtê)

Helbestê: (Bi dil Îro xedeng im ez)

Bi dil Îro xedeng im ez

Ji mekra wan du sultanen (p.x, r. 128)

- - - + / - - - +

Mefa'îlun Mefa'îlan

(behra hezecê)

Helbestê: (Ger tu nazik sorgul î)

Ger tu nazik sorgul î

Ez bilbilê mes tane me (p.x, r. 131)

- + - - / - + -

Fa'îlatun fa'îlan

(Behra remelê)

Helbesta : (ya îlahî tu kerîmî)

Ya îlahî tu kerîmî

Tu xefûrî tu 'ezîmî (p.x, r. 53)

- + - - / - + - -

Fa'îlatun Fa'îlatun

(behra remelê)

Helbestê : (îro me dî mewmek çi xweş)

Îro me dî mewmek çi xweş

Lew min hebîb wê hat bimeş (p.x, r. 96)

- - - + - / - + -

Mustefîlan Mustefîlan

(behra hezecê)

Helbestê : (subhan ji mirê qadirî)

Subhan ji mî rê qadirî

Adem ji tî nê çêkir î (p.x, r. 65)

- - + - / - - + -

Mustefîlan Mustefîlan

(behra hezecê)

Helbestê : (Kan me'dena sidq û sefa)

Kan me'dena sidq û sefa

Kan 'taya cûd û sexa (p.x, r. 134)

-- +- / - + -

Mustef'ilun Mustef'ilun

(*behra recezê*)

Helbestê : (ya ilahî ez xerîb im)

Ya ilahî ez xerîb im

Daîma her dilkebîb im (p.x, r. 68)

- + - - / - + - -

fa'ilatun fa'ilatun

(*behra remelê*)

Helbestê : (ya reb hewar sed car hewar)

Ya reb hewar sed car hewar

Perwane qet nakit qerar(p.x, r. 71)

- - + - / - - + -

Mustef'ilun Mustef'ilan

(*behra recezê*)

Helbestê : (Ji derdê îşqî rencûr im)

Ji derdê îş qî rencûr im

Nekêşit kes cefaya min (p.x, r. 160)

+ - - - / + - - -

Mefa'ilun Mefa'ilun

(*behra hezecê*)

Helbestê : (Ya rebbena qadir tu yî)

Ya rebbena qadir tu yî

Ez dê ji kê gazinde kem (p.x, r. 74)

- - +- / - - + -

Mustef'ilun Mustef'ilun

(behra recezê)

Helbestê : (Baziyê hecrî)

Baziyê hec rî ji nû dil rave rûyê mexlebê
Kun dikit fur qet dilan hem rengê şîş û metqabê (p.x, r. 143)
- + - / - - + - / - - + - / - - + -

Fa'ilatun Fa'ilatun Fa'ilatun Fa'ilun

(behra remelê)

Helbestê : (El wefa bê wesl û canan)

El wefa bê wesl û canan xemz û naza min nehat
Ya tu qelbê 'aşıqanî gulnîgara min nehat (p. x, r. 105)

- + - - / - + - - / - + - - / - + - -
fa'ilatun fa'ilatun fa'ilatun fa'ilan

(behra remelê)

Helbestê : (Sibh û êvarê seva tarî)

Subh û êva rî şeva ta rî şemal a kê yî tu
Leyletul Qed r û Beratın nûra mal a kê yî tu (p.x, r. 102)

- + - - / - + - - / - + - - / - + - -
fa'ilatun fa'ilatun fa'ilatu fa'ilan

(behra remelê)

Berhevdane bateyî û girgaşî

Ji lutfê û 'inayatê
Tu yî mensû rê rehmanî (p.x, r. 152)

+ - - - / + - - -
Mefa'ilun Mefa'ilun

(behra hezecê)

Helbestê : (Heqqa tu padîşahî)

Heqqa tu padîşahî
Rezzaqê cinn û ins î (p.x, r. 56)

- - + / - + - -

Mef'ulu fa'ilatun

(*behra muzarihê*)

Helbestê : (Ey ne'tê tu)

Ey ne'tê tu ez 'erşî heta ferşî şehîra

Ez perte wênûra te cihangeşt munîra (p.x, r. 80)

- - + / + - - + / + - - + / + - -

Mef'ulu Mefa'îlu Mefa'îlu fe'ulan

(*behra hezecê*)

Helbestê : (Ey dilo mizgîniya min hat)

Ey dilo miz gîniya min hat û paşa yê heleb

Van li wilda girtî exam yê ji ber to qa qeseb (p.x, r. 141)

- + - - / - + - - / - + - - / - + -

Fa'ilatun Fa'ilatun Fa'ilatun Fa'ilun

(*behra remelê*)

4. Serwa (Qafiye) û Cûreyên Wê

Serwa ji du peyvên ku divê herî kêr di dawîya du risteyan de ji aliyê deng ve wek hev, ji aliyê wateyê ve cuda bin re tê gotin¹⁰⁹. Ji bo ku wekhevîya dengên nav du peyvên serwa were hesibandin divê ev peyv ji hêla deng û wateyê ve ne yek bin. Melayê Bateyî di helbestên xwe de piranî serwa bi kar anîye, di hinek helbestan de paşserwa heye.

4.1. Li gorî Cihê wê yê Di Risteyê da

4.1.1. Serwaya Kutayî

Ji serwaya di dawîya risteyan de cih digire re tê gotin.¹¹⁰

¹⁰⁹ Serdar Yılmaz, *Dîwana Şêx Şemsedînê Exlatî*, Teza Lîsansa Bilind, Zanîngeha Mardin Artukluyê, Enstîtuya Zimanên Zindî yê Tirkiyeyê, Mêrdîn 2013, r. 75.

¹¹⁰ Yılmaz, *b.n.b.*, r. 76.

Kanê gelo şahê letîf
Kan qameta şubhê elîf
Mesken di nêv rewda serîf
Kanê muhemmed mustefa (p.x, r. 134)

Bûye tarî û zulmate
Sir û serma ji nû hate
Yeqîn kanûn eda hate
Binêrin dax û kovanê (p.x, r. 125)

4.1.2. Serwaya Navekî

Serwaya ku di nav risteyan de cih digire.¹¹¹
Dilbera gerden şefîf î, danuwa durra 'Eden
Nazik û mewzûn letîf î, nexliya selwa çîmen (p.x, r. 102)

Tu nîgarendeyê hût î
Tu nimanendeyê qût î (p.x, r. 54)

4.1.3. Serwaya Sereta

Serwaya ku di despêka risteyan de cih digire¹¹².

Hilo rabe Ebul qasim
Hilo ey qasidê ekber
Hilo fexra benî haşim
Hilo rabe tu yî rehber (p.x, r. 89)

Wekî mecnûnî dîn im ez
Wekî bilbil dixwînim ez (p.x, r. 146)

¹¹¹ Yilmaz, b.n.b., r. 76 .

¹¹² Yilmaz, b.n.b., r. 76 .

4.2. Li Gorî Hevbeşiya Denga Cureyên Serwayê

4.2.1. Qafiyeya Murdef

Ew qafiyeyê ye ku di xwe de herfa “rîdf”ê dihewîne. Herfên rîdfê jî “*elîf, waw, yê*” ne. Divê yek ji herfên îlletê bêyî ku herekeyek stendibe, beriya herfa rewiye û di qafiyeyê de bê dúbarekirin.¹¹³

Bi dil îro xedeng im ez

Ji mekra wan du sultanan

Bi teb'ê xweş biçûk im ez

Bi giryan im şebistanan (p.x, r. 128)

Binêr daxa me êxsîr a

Xezam zer bûn rezê mîr a (p.x, r. 125)

Zincîr û tayê qenar

Ser daye goşê guhar (p.x, r. 113)

Xuda gotê: eya mehmûd

Ez im xaliq ez im me'bûd (p.x, r. 95)

4.2.2. Qafiyeya Mucered

Qafiyeya ku tenê bi dúbarekirina herfa rewiye pêk tê qafiyeya mucered e.¹¹⁴

Hilo rabe Ebul qasim

Hilo ey qasidê ekber

Hilo fexra benî haşim

Hilo rabe tu yî rehber (p.x, r. 89)

Baziyê hecrî ji nû dil rave rûyê mexlebê

¹¹³ Adak, *b.n.b.*, r. 397.

¹¹⁴ Adak, *b.n.b.*, r. 397.

Kun dikin furqet dilan hem rengê şîş û metqebê (p.x, r. 143)

Ger tu nazik sorgul î

Ez bilbilê mestane me

Horiya reş kakul î

Ez aşiqê dîwanw me (p.x, r. 131)

4.2.3. Qafiyeya Muqeyyed

Di menzûmeyekê de xeynê herfên rîdfê (*elif, waw û yê*) beriya herfa rewiye, bi dûbarekirina herfên hemcîns ên ku bêhereke ne pêk tê.¹¹⁵

Te ne lewn e te ne reng e

Te ne awaz û ne deng e

Te ne endam û ne çeng e

Kes nizanî tu kusa î (p.x, r. 54)

Te ne xab e te ne xurd e

Te ne mal e te ne perd e

Te mekan nîne li erd e

Tu wekîlê hemî ca yî (p.x, r. 54)

Me çav mabûn li wê xeyla

Dikim hawar û waweyla (p.x, r. 150)

4.2.4. Serwaya Muesses

Eger berî rewiye herfeka bi hereke û berî wê jî "elif" ek hebe "serwaya muesses" tê meydanê.¹¹⁶

Herdu bi rêz û 'adet

Tînin du ser qelûnan

¹¹⁵ Adak, *b.n.b.*, r. 398.

¹¹⁶ Adak, *b.n.b.*, r. 398.

Hindî te heye taqet
Neçe nêzîkî mûnan (p.x, r. 58)
Fedl û xenîmê hatil
Xeyrî te cumle batil (p.x, r. 76)

4.3. Paşserwa

Piştî serwayê û di dawiya misrayan de ji her cure tekrarên ku tên kirin re paşserwa (redîf) tê gotin.¹¹⁷ Li gorî tiştên ku tên dubarekirin sê cureyên paşserwayê hene.

4.3.1. Paşserwayên ku di Halê Qertafan de ne

Di vê cureya paşserwayê de tiştên ku tên dubarekirin ji qertafan tenê pêk tên¹¹⁸.

Ey ne'tê tu ez 'ersî heta fersî şehîr a
Ez pertewê nûra te cihangeşt munîr a
Ey seyyîdê 'alem bike perwayê esîr a
Ey tacê serê şah û selatîn û emir a (p.x, r. 80)

Baziyê hecrê ji nû dil rave rûyê mexleb ê
Kun dikit furqet dilan hem rengê şîş û metqeb ê
Zalimê çerxê behêtin ger reşadê lewleb ê
Ya rebî dîsan muyesser ke ji bo min metleb ê
Bê hîcabane bibînin carek di dêm kewkeb ê (p.x, r. 143)

4.3.2. Paşserwayên ku di Halê Qertaf û Bêjeyan de ne

Di vê cureya paşserwayê de tiştên ku tên dubarekirin ji qertaf û bêje yan jî kombêjeyan pêk tên.¹¹⁹

¹¹⁷ Adak, *b.n.b.*, r. 399.

¹¹⁸ Adak, *b.n.b.*, r. 399.

¹¹⁹ Adak, *b.n.b.*, r. 399.

4.3.2.1. Qertaf û Bêje

Lif û rîşî û şetr î tîn

Bi çîn çîn taze xemr î tîn

Ji baxê taze qumr î tîn

Bi refref werdek û sîn e (p.x, r. 119)

Îmamê enbiyan î tu

Li qur'anê xudan î tu

Pez î new xweş şivan î tu

Şivanê ûmmeta yekser (p.x, r. 90)

4.3.2.2. Qertaf û Kombêje

Lew Yusuf î di husnê xwe da

Lew Dawûd î di dengê xwe da

Gul kemmilîn di baxê xwe da

Bilbil ezim min ruh feda (p.x, r. 96)

Subh û êvarî şeva tarî şemal a kê yî tu

Leyletul Qedr û Beratin nûra mal a kê yî tu

Çiçeka Baxê Îrem şûx bejn û bal a kê yî tu

Bo Xudê key bêje min kanê şepal a kê yî tu

Dêm ketêbe zulf û haşê şerhê xal a kê yî tu (p.x, r. 102)

4.3.3. Paşserwayên ku di Halê Bêje an jî Kombêjeyan de ne

Di vê cureya paşserwayê de qertaf tine ye. Piştî serwayê bêje yan kombêje tîn dubarekirin.¹²⁰

Birîndaran birîn xweş bûn

Reqîban herdu rû reş bûn

Di baxê husnê gulgeş bûn

¹²⁰ Adak, b.n.b., r. 400.

Nekêşit bulbul azarek (p.x, r. 163)

Kemançe û 'ûd û mûnîs **bû**

'Eceb sultanê meclîs **bû**

Ji 'eqlê batey muflîs **bû**

Ji fehm û 'eql û zanîn e (p.x, r. 119)



BEŞA SÊYEM

HÛNERÊN EDEBÎ

1. Ciwankarî (El Bedî')

1.1. Ciwankariya Hunerên Têkildarê Peyvan:

1.1.1. Hevrêgezî (Cînas)

Ji aliyê ciwankariyê ve ew peyv in ku lêvkirin û nivîsandina wan wek hev in, lê wateyê wan ji hev cihê ne¹²¹ ew jî du core:

1.1.1.1. Hevrêgezî Temam (Cînas Tam)

Dema ku helbestvanek, di malikekê de yan du malikên li pey hev de yan jî di hevokekê de hin peyvên wisa bi kar bîne ku, hemû tîpên wan li aliyê jimare û cor û rîzbûna dangan wek hev bin. Lê wateyê wan ji hev cihê bin¹²².

Mînak:

Ji şerqê roj ku hate der

Dinê pêkve bûye enwer

*Dibînît **dilbera dilber***

Muferreh bûm di gel wê da (p.x, r. 147)

(Dilber – navê yara wî ye, dilber – ew kes ku dilan dibatin)

*Qewlê wî da xafil **nebî***

Heta tenefus dê hebî

*Sellû 'ela rûhul **nebî***

Kanê muhemmed mustefa (p.x, r. 136)

(Nebî – lêker e, nebî – pêxember)

1.1.1.2. Hevrêgezî Natemam (Cînas Naqis)

Ji wê hunera ku cihê tîpên peyvekê tên guherîn, an jî tîpên peyvê tên kêmkirin an jî zêdekirin an jî di peyvekê de tîpek ji hev cuda dibin re tê gotin.¹²³

Mînak:

¹²¹ Nezîr Ocak, *Edebiyata Kurdî*, Weş. Sîtav, Ç.Yekem, Wan 2016, r. 124.

¹²² Îdrîs Edbullah, *b.n.b.*, r. 224.

¹²³ Îdrîs Edbullah, *b.n.b.*, r. 232.

Şêx û sebî her middetê

Ew razîq e rizqî detê (p.x, r. 66)

(Razîq – rizq, tîpa (a) zêdeye)

Enîgul bû belê spî bû

Bi garden şuphetî sî bû (p.x, r. 108)

(Spî – sî, tîpa (p) zêdeye)

Şemala min şefeq se'dê

Dinalim şûbhetî re'dê (p.x, r. 109)

(Se - re'd, tîpên (s, r) ji hev cuda ne)

Birîndarê di ser tîr im

Di baxê muhbetê mîr im (p.x, r. 161)

(Tîr – mîr, tîpên (t, m) ji hev cuda ne)

Ez im daîm di xelwê me

Bi dil daîm di gel wê me (p.x, r. 147)

(Di xelwê me - di gel wê me, tîpên (x, g) ji hev cuda ne)

Şukurullah min ji hubba dilberê ava ye dil

*Sal û mahan daîma **hem mehî** 'enqaye dil* (p.x, r. 142)

(Hem – meh, tîp wak hevin lê rîzbûna wan cuda ye)

Binêr daxa me êxsîra

*Xezam **zer** bûn **rezê** mîra* (p.x, r. 125)

(**Zer** – **rez**, tîp wak hevin lê rîzbûna wan cuda ye)

1.1.2. Pirtkirin-Kertkirin (Tesmît):

Helbestvan carna di malîkekê de risteyekî dike du perçe an sê bes, daku serwayekî nû jê ra çê bike (sazbike).¹²⁴

¹²⁴ Gerdî, *b.n.b.*, r. 40.

Mînak:

Were destan hebîba min

Bike derman tebîba min (p.x, r. 163)

(An, serwayekî nû ye)

Li dil baran xeman bar e, Ne Nîsan e na Adar e

Heroj Batey bi hawar e, di destan maye guftarek (p.x, r 164)

(Ar, serwayekî nû ye)

1.1.3. Vegêrandin

Helbestvan di malikekê de peyvekê du caran an zêdetir bikartîne bes bi mebestên ciyawaz (cuda).¹²⁵

Mînak:

Derd û dax im bê qerar im bê bihar im bê çemen

Bê hebîb im bê tebîb im hem xerîb im bê weten (p.x, r. 105)

(Bê – çend carek dubare bûye)

Gullîbas î, gulqiyas î, gulênî gulpîrehan

Ahûya deşta tetarê rehzena aska xelen (p.x, r. 102)

(Gul – çend carek dubare bûye)

1.1.4. Înandin

Helbestvan di malikê yekem de peyvekê tîne, heman peyv di malikê duwem de dubare dibe, an li destpêk û dûmahî malikekê peyvek dubare dibe¹²⁶.

Mînak:

Merheba ey sirrê furqan merheba

Merheba dermanê derdan Merheba (p.x, r. 197)

Nizanî bite rehber

Bê dad ji ber nizanî (p.x, r. 62)

¹²⁵ Gerdî, b.n.b.,r. 42.

¹²⁶ Gerdî, b.n.b.,r. 44.

1.1.5. Dubarekirin (Tekrîr)

Ji wê hunera ku heman peyv yan jî heman tîp hostatî çend li du hav di nava malikê de tê bikaranîn re tê gotin.¹²⁷

Mînak

Guneh û sûç û şuweşî

Mekirne ta'etî keşî

Ya Xweda ger me nebexşî

Ay û ay û ay û ay (p.x, r. 55)

(Ay û ay, tekrîr)

Zulfa ku tête ser Milan

Çengal e tavêjî dilan

Qir kir ehlê berçelan

Dad û meded dad û meded (p.x, r. 111)

(Dad û meded, tekrîr)

Di roja heşr û pir hey hey

Hezaran pê li ser yek pey (p.x, r. 92)

(Hey, tekrîr)

1.1.6. Jêgir-Lêwergirtin (Îqtîbas)

Ji wê hunera ku kesek di axiftin an jî nivîsînên xwe de cih bide gotineke navdar an jî nivîseke bi nav û deng ku hemû kes bizanin re tê gotin, ev gotinên navdar bi giştî ji ayetên Qurana pîroz , hedîsên pêxember tên girtin.¹²⁸ Di jêgirê de ne pêwîst e ku temamiya ayet an hedîsê were gotin an jî nivîsîn.

Mînak:

Melek hatin bi te'cîlî

Du şeq kir sine Cibrîlî

(Elem neşreh) tê tenzîlî

Dikit tewzîh û tibyan (p.x, r. 84)

¹²⁷ Ocak, *Edebiyata Kurdî*, r. 104.

¹²⁸ Ocak, *Edebiyata Kurdî*, r. 120.

(Elem neşreh – sûreta (înşîrah) ayeta 1an)

Haşa hebin 'uzw û cesed

Tehwîlê îmkanê xired

(We lem yekun kufwn ehed)

Zatê qedîm her dê hebî (p.x, r. 65)

(We lem yekun kufwn ehed, sûreta (îxlas) ayeta 4an)

1.1.7. Tesrî'

Ji bo makikên ku her du sedr û 'eczê wî heman tîp bin jê ra tesrî' tê gotin.¹²⁹

Mînak:

Sibh û êvarê şeva tarî şemala kî yî tu

Leyletil Qedr û Beratin nûrê mala kî yî tu

Çîçeka Baxê Êrem soxî bala bejn û bala kî yî tu

Bo Xwedê key bêje min kanê sepala kî yî tu

Dêm ketîbe zulf û hasê serhê xala kî yî tu (p.x, r. 102)

1.1.8. Paşserwa (Redîf)

Piştî serwayê û di dawîya misrayan de ji her cure tekrarên ku tên kirin re paşserwa (redîf) tê gotin.¹³⁰

Mînak:

El –wefa bê wesl û canan xemz û naza min nehat

Ya tu qelbê 'aşiqan î gulnîgara min nehat (p.x, r. 105)

(Min nehat, paşserwa ye)

Sibh û êvarê şeva tarî şemala kî yî tu

Leyletil Qedr û Beratin nûrê mala kî yî tu (p.x, r. 102)

(Kî yî tu, paşserwa ye)

¹²⁹ Îdrîs Edbullah, *b.n.b.*, r. 260.

¹³⁰ Adak, *b.n.b.*, r. 399.

1.1.9. Rengîn-Têrziman (Mulemme')

Helbestvan di helbesta xwe de ne tinê zimanek, çend zimanan bikatîne, lê eywendiya wan ji aliyê wateyê ve bi hev girêdayîn e.¹³¹

Mînak:

Batey tu bike bê xem

Digel sirra xwe mehrem

(Wexfîr lî zenbî werhem

Entel xefûr-ur rehîm) (p.x, r 77)

(Wexfîr lî zenbî werhem, Entel xefûr-ur rehîm, erebî)

Min dî vebûn dergah û der

Ê têkelî bengê seher

(Der kûş û hûş im şud xeber)

Batey! Bixwaze metlebê (p.x, r. 67)

(Der kûş û hûş im şud xeber, farisî)

1.1.10 Teradûf (Hemwateyî)

Di risteya helbestê de du yan jî sê peyvên ku wateya wan yek bin tê dîtin. Bi xêra hunera hemwateyî helbestkar wateya peyvê xurt dike.¹³²

Ez feqîr im be biha me

Rûreş im hem rûsiya me (p.x, r. 68)

(Rûreş û rûsiya)

Çi gul bû ew çi bilbil bû

Mirad û metleba dil bû (p.x, r. 110)

(Mirad û metleb)

¹³¹ Îdrîs Edbullah, *b.n.b.*, r. 268.

¹³² Ocak, *Edebiyata Kurdî*, r. 102.

1.2. Ciwankarî - Hunerên Têkildarê Wateyê

1.2.1. Dijberî (Tezat)

Ji wê hunera wêjeyî ya ku di risteyê yan jî di malikan de ji aliyê wateyê ve du peyvên dijwateyî bi hev re tèn bikaranîn re tê gotin.¹³³

Mînak:

Ger çi **xaib** sûret î daîm ji min lê **hazir** î

Çehniqab avêt û meşya hate der sîmaperî (p.x, r. 141)

(**Xaib – hazir, Dijberî** ne)

Gote min ya serxweş e

Tiştêkê min mehweş e

Leş sipî û dil reş e

Ew çi ye çi dê bizan (p.x, r. 121)

(**Sipî – reş, Dijberî** ne)

Her daîma peyapey

Bedqelbî nabît êmin

Sed qenciyan di gel key

Nabîte dost ne duşmin (p.x, r. 61)

(**Dost – duşmin, Dijberî** ne)

1.2.2. Cih gorîn

Di malikekê de du peyv bi hev re tèn, di malikê din de heman peyv tèn lê cihê wan dê gorîn re tê gotin.¹³⁴

Sed car hewaran dikemê, ya agehdarê 'alemê

Derman bike vê elemê, ya reb tu yî dermanê min

Vê elemê derman bike, sirra ezel zahir bike

Daxa dilan hasil bike, ya reb tu yî dermanê min (p.x, r. 71)

¹³³ Ocak, *Edebiyata Kurdî*, r. 100.

¹³⁴ Gerdî, *b.n.b.*, r. 77.

(Derman bike vê elemê - Vê elemê derman bike)

Were canim bibîn halim, ne min dil ma ne dildarek?

Ne dildar û ne min dil ma, ne lu'al û ne sorgul ma (p.x, r. 63)

(Ne min dil ma ne dildarek - Ne dildar û ne min dil ma)

1.2.3. Xweşbahane-Ciwanîbayîs (Husn-u Talîl)

Bûyereke pêkhatî bi sedemeke xweş re tê girêdan û sedema rastî tê mandelekirin. her wiha dive ku helbestvan bi xwe jî ji bûyerê bi bawer be.¹³⁵

Ey ne'tê tu ez 'ersî heta fersî şehîra

Ez pertewê nûra te cihangeşt munîra (p.x, r. 80)

(Rûnahiya cihan ji sedema pertewê nûra te ye)

Ey le'lê lebit ezmê remîmî diket ehya

Ber şewqa rûyê te bûye sergeşte sureyya

Cûşan û xurûşan ji fîraqa te ne derya (p.x, r. 81)

(Sergeşte bûna sureyya ji sedema şewqa rûyê te ye- Cûşan û xurûşana derya ji fîraqa te ne)

1.2.4. Jinezanînvehatin (Tecahûl-î Arîf)

Ji wê hunera ku mijar û babeta wê tê zanîn, lê helbestvan xwe bi qerfeyekê ku wê rastiye bipeçine ve digire, xwe linezanîne datîne re tê gotin.¹³⁶

Gelo bîşeng eyan 'er 'er

Gelo yan misk e yan 'enber

Şepala nazika esmer

Bi xilxal û selasil hat (p.x, r. 107)

(Dizane ku dilbera wî ne bîşeng e, ne 'er 'er e û ne jî misk û 'enber e; lê ji nezaniyê ve tê)

¹³⁵ Sûcadî, b.n.b., r. 76.

¹³⁶ Ocak, *Edebiyata Kurdî*, r. 108.

Kan me'dena sidq û sefa
Kan e'taya cûd û sexa
Behra kerem kanê wefa
Kanê muhemmed mustefa (p.x, r. 134)

(Wî dizane ku pêxember li kûye, lê xwe linezanîne daye)

1.2.5. Bîranîn- Têlnîşan (Telmîh)

Ji wê hunera ku kesek di gotin an jî nivîsînî xwe de awirekî dide serbihoriyeke mêjûtî. Ango kesek bi vegotina hin peyvên bûyereka hatiye jiyîn tîne bîra guhdaran, mijara rûdanên wê hunerê, dibe ku mucîzeyên pêxemberan, efsane, evîndarên navdar bin.¹³⁷

Sed wekî 'Îsa û Eflatûn
Û Calînûsê hekîm
Çareyê j' derdê me nakin
Bê te ey Loqmanê m. (p.x, r. 133)

(‘Îsa, Eflatûn, Calînûs, telmîh e)

Wekî mecnûnî dîn im ez
Wekî bilbil dixwînim ez (p.x, r. 146)

(mecnûn - telmîh e ji bo dastana leyl û mecnûn)

Wadiya eymen ku tarî bît kî ye feryadres
Ma ji tûrê dê tinê helbit li min nûrîn qebes (p.x, r. 144)

(Wadiya eymen, tûrê, nûr - telmîh e ji bo çîroka nebî Mûsa)

Hudhude ger ku xuya bît bê ji belqîsê seba
Pê mufferreh bît suleyman mutmeîn bît cane me (p.x, r. 133)

(Hudhude, belqîs, suleyman - telmîh e ji bo çîroka nebî Suleyman)

¹³⁷ Ocak, *Edebiyata Kurdî*, r. 117.

1.2.6. Pêwendî - Komkirin (Tenasûb)

Tenasûb, peyvên ku di navbera wan de ji hin aliyan ve têkilî û pêwendî hebin tê çêkirin. Bêjeyên ku hatine nivîsîn an jî hatine gotin di bin babet û pêwendiyekê de tê civandin.¹³⁸

Rahet û sebr û selam

Tu yî çapik û xweşxeram (p.x, r. 115)

(Rahet û sebr û selam – tu yî)

Selasil toqê gelwaz in

Guhar û berben û bazin

Hizar rengê bi awaz in (p.x, r. 107)

(Guhar û berben û bazin - Hizar rengê bi awaz in)

1.2.7. Fîşalekirin (Mubalexe)

Kesek li şîroveya tiştêkî gelekî zêderewiyê bike mirov dikare bibêje di vir de mubalexe heye. Di mubalexeyê de tiştên ku mirov jê bawer neke û li dijî hewna mirovan tê dîtin û ev tiştên ku tên bilêvkirin tu caran pêk nayên.¹³⁹

Mînak:

Ji bo wî çêbû ev 'alem

Nebî bû hêj herî adem (p.x, r. 85)

(Ji bo wî çêbû ev 'alem – Mubalexe ye)

Serxweş im min hal çu nîne

Cerg û dil safî birîne

Rondikêm tên av û xwîn e

Mam di nav qewmê xerîb (p.x, r. 69)

(Cerg û dil safî birîn e, rondikên ku tên xwarê jî tev xwîn e. Mubalexe ye)

¹³⁸ Gerdî, *b.n.b.*, r. 107.

¹³⁹ Ocak, *Edebiyata Kurdî*, r. 94.

1.2.8. Şirovekirin (Tefsîr)

Helbestvan di helbesta xwe de peyveke heye wateye wî nediyare di rêzka din de vî peyvê şirove dike.¹⁴⁰

Vê elemê derman bike

Sira ezel zahir bike

-Elem çi ye muhebbet e

Derman sebr û sekînet e (p.x, r. 71)

(Di makikê duyem de, peyvên elem û derman şirovekiriye)

Eger hekîm e lûqman e

Dawûd digel suleyman e

Nizanin min çi kovan e (p.x, r. 73)

Kovana min muhemmed e

Ji bo roja qiyamet e

Bo me biket şefa'et e (p.x, r. 73)

(Di makikê duyem de, peyvê kovan şirovekiriye)

1.2.9. Pendbêjî

Helbestvan komelka tiştan tîne ji bo xwînwr û guhdaran di jiyane wane a rojane dibe ders¹⁴¹.

Nezanî qence berden

Bajon biçîte garan

Şola deh jê xeberden

Ser nagirit çu çaran (p.x, r. 63)

Qenc nîne bibye heval

Di gel xemmas û qelsî

Serê bê minnet û pal

¹⁴⁰ Îdrîs Edbullah, *b.n.b.*, r. 342.

¹⁴¹ Îdrîs Edbullah, *b.n.b.*, r. 349.

Mîr e li ser text û kursî (p.x, r. 62)

Kijêt di şor guhar e

'Eta ken pîr û kala

Her meyyîtê li der e

Mere di qewlê mala (p.x, r. 59)

1.2.10. Pirs û Bersiv (Tercî' fil Mihawere)

Helbestvan pirs û besivên ku bi giftugoyan tên bersiv dan nîşan dide.¹⁴²

Mînak:

Xweda gotê: eya mehmûd

Ez im xaliq ez im me'bûd

Tu çî bixwazî bikim meqsûd

Li dîwana me terxanî (p.x, r. 95)

Îlahî tu bike minnet

Bide min mehdera ummet

Subhê nebînin çu zehmet

Di nêv agir û nîranî (p.x, r. 95)

Gote min şahê çikil

Tiştêkê min li ser mil

Pê ve kirin du sed dil

Ew çî ye çî dê bizan (p.x, r. 120)

Min gotê bawer bike

Fikrê ji dawer bike

Zulfan tu satir bike

Sohtime ez el eman (p.x, r. 120)

¹⁴² Îdrîs Edbullah, *b.n.b.*, r. 366.

1.2.11. Roçûn (Îtra)

Helbestvan ne bi tenê pesna kesekî diketin, belkî behsa bab û bapîrê wî jî diketin, di medha wî de rodiçe.¹⁴³ Derheqê pêxember dibêje:

Hate eslab û bitûnên tahire
Qet nebû yek jê xerab û facire
Silsila wî ta bi adem da û bab
*Pêkve dê biçne behest bê hîsab*¹⁴⁴

2.12. Lomeyê Xwe Kirin (Nefis piçûkbûn)

Helbestvan xwe lome dike û 'îtab li xwe digre.¹⁴⁵

Ez feqîr im bê biha me
Rûrereş im hem rûsiya me (p.x, r 68)

(Feqîr, bê biha, rûrereş, rûsiya – lomekirin)

Di qeyda te da mehbûs ez im
Di 'ehda xwe da meyûs ez im
Lew mucrim û 'asî ez im
Xoş xatemî di lutfa xwe da (p.x, r 97)

(Mehbûs, meyûs, mucrim, 'asî - lomekirin)

1.2.13. Poşîn (Tewriye)

Bêjeyeke ku di nava malikê yan jî risteyê de herî kêmbi du wateyan hatibe bikaranîn jê re dibêjin ciwankariya tewriyeyê. Dibe ku wateya peyvê ji dido yan zehftir be û peyv pirwateyî be jî.¹⁴⁶

¹⁴³ Îdrîs Edbullah, *b.n.b.*, r. 336.

¹⁴⁴ Şemerxî, *b.n.b.*, r. 22.

¹⁴⁵ Îdrîs Edbullah, *b.n.b.*, r. 323.

¹⁴⁶ Muhsîn Ehmed Mustefa, *Behara Rewanbêji*, Çapxane Narîn, Hewlêr 2013, r. 306.

Çi gul bû ew çi bilbil bû
Mirad û metleba dil bû
Eger çî ew ji min sil bû
Ji bo Batê Hemaîl hat (p.x, r. 110)

(Hemaîl: 1. Navê xanima wî, 2. Nivişt)

Biçûkê 'işqa bedxwû me
Li ser teb'e xwe ez çûme
Li min 'amî nekin lûme
Ji dil gestim du eylanan (p.x, r. 128)

(Ji dil gestim: 1. Bi rastî ez gez kirime, 2. Ciyê ku gez kirine dilê min e)

3. Watenasî

Ji bo ku wate ciwan û rewan bibe û guhdêr baş fam bike, pêdivî bi hevokên ciwan û zanistî heye¹⁴⁷.

3.1. Îstîfham

Hunera pirsê ye. Gelek caran ev pirs ne li hêviya bersivê ye.¹⁴⁸

Subh û êvarî şeva tarî şemala kê yî tu ?
Leyletul Qedr û baret in nûra mala kê yî tu?
Çîçeka baxê îrem şox û bejn û bala kê yî tu ?
Bo Xudê key bêje min kanê şepala kê yî tu?
Dem kitêb e zulf e xaşî şerha xala ke yî tu? (p.x, r. 102)

(Ke yî tu? Îstîxfam)

Kanê emîrunel bewab?
Kanê gelo kuhnê sehab?
Kanê 'Ummer binî xetab?
Kanê muhemmed mustefa? (p.x, r. 135)

¹⁴⁷ Muhsîn Ehmed Mustefa, *b.n.b.*, r. 17.

¹⁴⁸ İlhan, *b.n.b.*, r. 25.

(Kanê? îstîxfam)

3.2. Gazîkirin (Nîda)

Ji wê hunera ku helbestvan hestiyarbûna xwe nîşan dide re tê gotin. Bi piranî baneşana "ya" û "ey" ê bikaranîne.¹⁴⁹

Ya reb hewar sed car hewar

Perwane qet nakit qerar

Xweş muhbetê havêtî nar

Ya reb tu yî dermanê min (p.x, r. 71)

(Ya reb – Bangkirin)

Ey rahimê rehma qedîm

Hem daîm û heqq û elîm

Cumleyê derdan tuy hekîm

Ez dê ji kê gazinde kem (p.x, r. 74)

(Ey – Bangkirin)

Xuda gotê: Eya Mehmûd

Ezim xaliq ez im me'bûd

Tu çi bixwazî bikim meqsûd

Li dîwana me terxanî (p.x, r. 95)

(Eya Mehmûd! Bangkirin)

3.3. Ragihandin (Xeber)

Ji wê hunera ku helbestvan der barê rewş û bûyeran agahî û ramanekê dide.¹⁵⁰

Du eslanan we reng hatin

Bi tabûr û tiveng hatin (p.x, r. 129)

(Hatin – Ragihandin)

¹⁴⁹ İlhan, *b.n.b.*, r. 25.

¹⁵⁰ İdrîs Edbullah, *b.n.b.*, r. 24.

Ji bextê min reşî rabû

Xiyala min ne batil hat (p.x, r. 107)

(Rabû – Ragihandin)

3.4. Ferman (El Nehî)

Di nav malikê de fermanek heye, pêkanîna wê tê xwestin.¹⁵¹

Sirra meken aşîkar

Qenc e ew di xefî bin (p.x, r. 58)

(Meken – ferman)

Hindî te heye taqet

Neçe nêzîkî mûnan (p.x, r. 58)

(Neçe – ferman)

¹⁵¹ Îdrîs Edbullah, *b.n.b.*, r. 49.

ENCAM

Li gorî hin delîlên ku me di vê tezê de aşkere kirine, em dikarin bibêjin ku Mela Huseynê Bateyî di sed sala 17an û 18an de jiyaye. Ew helbestvanekî girîng yê edebiyata klasîk bûye. Hem bi zanistên dînî re hem bi tesewufê ra hem jî edebiyatê re mijûl bûye.

Quran û kesayetiya Pêxemberî bandoreka mezin û berfireh li ser hizr û ramanên Bateyî çekiriye. Ayetên Quran-a Pîroz di nav helbestên Bateyî de bi gelek şêwaz û cureyên cudacuda reng vedane. Hinek caran bi şêwazeke zindî ayet hatine bikaranîn. Hinek caran jî bi tenê wateyên ayetan û bûyer û çîrokên Quranê xistiye nav helbestên xwe. Li aliyê din de kesayetiya Pêxember Muhemmed (s.x.l) xwedî payeyeke mezin û berz(bilind) e li cem Bateyî. Bi curek ve ku Bateyî gelek helbestên xwe bi taybet nivîsandiye ji bo behskirina li ser jiyan û kesayetiya wî.

Bateyî Xweda naseka mazin bûye, ew dilketiyê Xwedê ye. Li dinyayê derdekî wî heye tenê "derman" a wî jî Xweda ye. Bateyî di dinyayê de ji du tiştan hez dike û ji bo wan dijî: A yekem Xwedê ye, a duyem pêxemberê wî yê Muhemmed (s.x.l) ye.

Bateyî tesewif naskiriye û bi xwe sofî bûye û têkeliya wî digel sofîyan hebûye. Lêbelê Bateyî wekî rêber û şêx xwe nedaye naskirin. Wî tenê Pêxemberê Xwedê bi dilber û rêberê xwe dizane.

Helbestên wî ji aliyê ziman ve jî bihêz e. Zimanê dîwanê sivik, zelal û asan e. Di dîwanê de peyvên Erebi, Farisî û Tirkî hatine bikaranîn. Lê bêtir bandora Erebi li ser helbestên Bateyî heye.

Helbestên wî bi qalibên erûzê hatiye nivîsandin. Ji hêla teşeyê ve bi kar anîna weke serwa(qafîye) û paşserwa(redîf) serkeftî ne.

ÇAVKANÎ

MEALA QURANA PÎROZ

ADAK, Abdurrahman, *Destpêka Edebiyata Kurdî Ya Klasîk*, Weş. Nûbihar, Ç.Yekem, Stenbol 2013.

NAFÎ' AKÎREYÎ, "Remzên Sofîgerî di Helbestên Kurdî ya Kilasîk-Behdînan" *Ko. Beyan*, J. 79, Baxdad 1982.

AMEDÎ, Sadiq Bahaeddin, *Hozanvanê Kurd*, Kurri Zanyariy Iraq, Baxdad 1980.

BAHOZ BARAN, *Rêzimana Kurmancî*, Weş. Belkî, Stenbol 2012.

BOTÎ, Ebdulhadî, *Pêxemberê Ummetê Muhemmed*, Ç. Sêyem, Weş. Nûbihar, Stenbol 2011.

BOZAN, Salih, *Çîroka Îsra û Mihracê*, Weş. Berêwebreyetî Çapxaneyî Roşnbîrî, Hewlêr 2013.

CAKSUN, Liyûnard, *Bos el-Binyewiye el-Edeb Walnezeriye el-Binyewiye*, W. Sayr Dîb, Menşurat Wezaret el-Seqafe, Dimeşiq 2001.

Dr.EMÎN MUTABÇÎ, "Quran di Helbestên Cizîrî de" *K.Roşnbîrî Newê*, J. 105, 1985 Bexda.

DOSKÎ, Tehsîn Îbrahim, *Melayê Bateyî Jiyan û Berhem*, Ç. Duyê, Dihok 2005.

EHSAN 'EBAS, *Fenul Şi'r*, Ç. Sêyê, Dar el- Seqafe, Bêrût.

'ELÎ TAHİR HUSEYN, *Rexney Bunyadgerî Li Tiyorî Ve Ji Bo Piraktîze Kirin*, Nameyê Diktora, Zankoy Silêmanî 2007.

MUHEMMED 'EZAM, *Tehlîl Xîtab el-edebî 'Ela dew el-mînahac el-neqdiye*, Menşurat Îtîhad Kuttab el-'Ereb, Dimeşiq 2003.

FUAD REŞÎD, *Binyad Gerî Le Roşnbîrî û Rexney Edebî Kurdîda*, Ç.1, Bilawkirawekînî Yekêtî Nûseranî Kurd -Liqî Kerkûk, Weş. Arabxa 2007.

'EZÎZ GERDÎ, *Rewanbêjî Di Edebyata Kurdî De*, Berga Duyem, Weş. Şarewanî, Hewlêr 1975.

HAFÎZ QAZÎ, *Ferhenga Qazî*, Ç. Duyem, Weş. Sipîrêz, Dihok 2005.

ÎBÎN REŞÎQ, *el-'Umde*, Ci 1, el-Qahîre 1955.

ÎDRÎS EDBULLAH MUSTEFA, *Layenên Rewanbêjî Di Helbestên Kilasîkiya Kurdî De*, Weş. Hacî Haşim, Hewlêr 2011.

- İLHAN, Ziver, *Mewlûda Melayê Bateyî*, Teza Lîsansa Bilind, Mêrdîn 2013.
- JİYAN, Rênas, *Melayê Bateyî-Mawlûd û Hemû Helbestên Wî*, Ç. Yekem, Weş. ,Amed 2013.
- SÎ. DÎ LIWÎS, *el- Sûre el- Şi'riye*, T.Ehmed Niseyf el -Cenabî, Bexdad 1982.
- MARIYO LAFLÎS, *Çemkî Binyad le Zanistên Civakî*, Wer. Sitar Batî Kerîm, Ko. Raman, J.113, Hewlêr 2006.
- AZAD EDBUL'EZÎZ MÎZÛRÎ, *Celadet Bedirxan û Şi'r*, Ç. Êkê, Weş. Sipîrêz Bo Çap û Bilavkirin, Dihok 2006.
- MUHEMMED EBDURREHMAN ÎBRAHÎM, *Îşq Lay Melay Cizîrî û Hafizî Şîrazî*, Teza Lîsansa Bilind (Master) Zankoya Silahedîn Kolîja Adab, Hewlêr2004.
- MUHSÎN EHMED MUSTEFA, *Behara Rewanbêjî*, Weş. Narîn, Hewlêr 2013.
- MUHSÎN QOÇAN, "Wênê Hozanê wek Awazekê Derbirînê", Ko. *Nûxazî*, J. 2, Dihok 1992, r.19.
- GÎWÎ MUKÎRYANÎ, *Ferhenga Mehabad*, Weş. Kurdistan, Hewlêr 1962.
- , *Ferhenga Kurdistanî*, Ç. Yekem, Weş. Aras, Hewlêr 1999.
- OCAK, Nezîr, *Edebiyata Kurdî*, Weş. Sîtav, Ç.Yekem, Van 2016
- , *Waneyên Rêzimana Kurmancî*, Weş. Sîtav, Ç. Yekemîn, Van 2014.
- MUHEMMED SALÎH PÊNDÎROYÎ, *Ferhenga Kanî*, Ç. Yekem, Weş. Sipîrêz, Dihok 2010.
- HEJÎR 'BDULLE PÛR, *Ferhenga Hejîr (Farisî – Kurdî)* ,Ç. Yekem, Berga Yekem, Weş. Xanî, Dihok 2008.
- SANKARA RAFÎNDÎRAN, *el-Bunyewiye el-Tefkikiye*, Wer. Xalîde Hamid, Dar-ul Şûn el-Seqafe el -'Ame, Bexdad 1987.
- SADÎNÎ, M.Xalid, *Mela Huseynê Bateyî Jiyan, Helbest û Berhemên Wî*, Weş. Nûbihar, Ç. Sêyem, Stenbol 2013.
- SE'D FARÛQ YÛSUF, *Binyatî Hûnerî Le Şi'rekanî Ehmed Mûxtar Caf Da*, Teza Lîsansa Bilind (Master) Kolîja Perwerde Yê Zankoya Selahedîn, Hewlêr 2011.
- SELAH FAZÎL, *Nezeriyetul el-bennayîye Fî el-neqd el-edebî*, Bexdad 1987.
- 'ELAEDÎN SICADÎ, *Xoşxwanî*, Çapxane Me'arîf, Bexdad 1978.

HUSEYN ŞEMREXÎ, *Mewlûd-Melayê Bateyî*, Weş. Nûbehar, Ç. Sêyem, Stenbol 2014.

ŞEWKET MELA ÎSMA'ÎL, *Ferhenga Şiwan*, Weş. Wezaretê Perwerde, Hewlêr 2007.

ŞÊX MUHMMEDÎ XAL, *Ferhenga Xal*, Beşa Yekem, Ç. Yekem, Weş. Kamran, Silêmanî 1960.

ÇINAR SIDÎQ XAZÎ, *Arastên Teknîkî Di Şi'ra Nû Ya Kurdî De – Devera Badînan*, Ç.Êkê, Weş. Sipîrêz Bo Çap û Bilavkirin, Dihok 2008.

MARÛF XEZNEDAR, *Mêjûy Edebî Kurdî*, Weş. Aras, Erbil 2010.

XURŞÎD REŞÎD, "Sofyeyî di Şi'rên Kurdî de", Ko. Beyan, j. 65, 1980.

YILMAZ, Serdar, *Dîwana Şêx Şemsedînê Exlatî (Metn û Lêkolîn)*, Teza Lîsansa Bilind, Zanîngeha Mardin Artukluyê, Enstîtuya Zimanên Zindî Yên Tirkiyeyê, Mêrdîn 2013.

YILDIZ, Reşit, "Di Helbestên Melayê Bateyî de Evîn û Hezkirin" *Bingol Üniversitesi Yaşayan Diller Enstitüsü Dergisi*, Yıl:1, Cilt1, Sayı 2, Kasım 2015.

'ELÎ NANEWA ZADE, *Ferhenga Herman*, Berga Yekem, Weş. Wezaretê Perwerde, Hewlêr 2005.

MİRŞÎD ZİBÊDÎ, *Bîna-ul Qesîdet-ul Fenî Fî el-Neqîd el-'Rbî el-Qedîm Wal Mi'asir*, Dar-ul Şûn el-Seqafe el-'Ame, Bexdad 1994.

PÊVEK

FERHENGA HELBESTÊN MELAYÊ BATEYÎ

Aferîd: Xuliqand

Ahû: Xezal

Al: Sor

Aloz: Tevlihev

Asimîn: Yasemîn

Aşna: Dost

Ateşgudaz: Agirhelîn

Badenoš: Meyxwir

Badîger: Yêd Din

Baxban: Baxçevan

Berçel: Zozanekî Hekkarî Ye

Berr: Erda Rast

Berze: Winda

Bîm: Tirs

Bîmar: Nexweş

Cam: Piyale

Cebhet: Enî

Cebîn: Enî

Çeng: Amêrekî Muzîkê Ye

Çeşim: Çav

Çetr: Sîwan

Çîz: Tişt

Çogan: Gopal

Çun: Wekî, Mîna

Curh: Birîn

Da'î: Gazîker

Darinde: Malî

Darul Qerar: Bihişt

Dêmmelek: Rûmelek

Derazîn: Berderî
Destegîr: Alîgir
Dîde: Çav
Dilawer: Mêrxas
Dirav: Pere
Duker: Du Parçe
Ecram: Guneh
Efxan: Hawar
'Endelîb: Bilbil
'Eqreb: Dubişk
Ewtan: Pirjimariya Weten, Welat
Exter: Stêr
Eylan: Mar
Ez: Ji
Farix: Vala
Gencîne: Xezîne
Gîsû: Kezî
Goş: Guh
Goş: Guh
Gulbav: Gula Bi Xunav
Gulpîrehen: Kiras Bi Gul
Gûşdar: Guhdar
Hemail: Jina Bateyî Bû, Curreyek Niviştan
Hemnişîn: Kesê Bi Meriv Re Rûniştî
Hingur: Mexrib
Hullepoş: Kesê Ku Xişir Bi Xwe Vekiriye
Kan: Jêdera Madenan
Kem: Kêm
Kewkeb: Stêrk
Kodek: Zarok
Kohsar: Cihê Bi Çiya
Kohsare: Çiyayî
Kozî: Çeper

Layezal: Bêçûn (Sîfetekî Xwedê Ye)
Leb: Lêv
Lewleb: Mecaze Ji Bo Çerxa Felekê Tê Gotin
Mader: Dayik, Mak
Mah: Heyv
Mehd: Dergûş
Mehd: Landik
Mêhr: Roj
Mehweş: Mîna Heyvê
Mêlak: Ceger
Merdîm: Meriv, Mirov
Merg: Mirin
Metleb: Daxwaz
Mexleb: Pencê Teyran
Mîsaq: Peyman
Mudam: Herdem
Mûn: Temah
Muqteda: Serwer
Muretteb: Rêzkerî
Mursel: Hinartî
Mutrik: Terkkirî
Muxnî: Amêrekî Muzîkê Ye
Muznib: Gunehkar
Namiwer: Navdar
Namiwer: Navdar
Nedîm: Heval
Ne't: Medh
Netrik: Xişreke Zînetê Ye
Newm: Razan
Nîgar: Sûret
Nîran: Agir
Noşmendî: Vexwarinî
Pasban: Nobedar

Paspan: Nobedar
Pengiyan: Tijîbûn
Pertew: Tîroj
Perwaz: Firîn
Pider: Bav
Piser: Kurr, Law
Qamet: Bejn û Bal
Qelûck: Qalikê Hişk
Qesar: Cil Spî
Qeswere: Şêr
Qulzem: Behra Sor
Qurmiz: Sor
Rehmê Fîzakey: Rehmê Belavkey
Rehzen: Rêbir
Rehzen: Rêbirr
Remîm: Riziyayî
Rewan: Ruh
Rewşen: Ronî
Rûbar: Çem
Ruxsar: Dêm
Rûzgar: Dem
Sara: Bê Xeş
Sazende: Çêker
Seffak: Xwînrêj
Şefî': Mehdervan
Sefwet: Paqijî
Sekînet: Aramî
Sekran: Serxweş
Şem': Mûm
Semîn: Qelew
Şepal: Şêra Mê
Serheşte: Sergêj
Sernugûn: Serberjêr

Şêt: Dîn
Sî: Qaz
Şigerf: Delal, Bêhemta
Şimsîr: Şûr
Sivlaq: Navê Mehabadê yê Kevn
Şol: Kar
Solîn: Kanî
Şor: Peyv
Spîndar: Hewr
Sûç: Guneh
Sûf: Hirî
Sufalîn: Axa ku Hatiye Sotin
Taban: Ronahî
Temed: Wek
Temr: Xurme
Tenem: Çermê Min
Terim: Laşê Mirî
Tesnîm: Kaniyeke Avê ye Li Bihiştê
Tewlîd: Rojbûn
Tezelzul: Hejriyan
Tîn: Herî
Tîra Seqîf: Tîreka Gelek Tîj
Tîz: Xoş
Tûba: Navê Darek Cennetê ye
Umm Ul Qura: Navekî Bajarê Mekehê ye
We Mam: Wisa Mam
Xab: Xew
Xakîpa: Axa Bin Pê
Xeberbezîn: Paşgotiniyê Dike
Xeclan: Şermkirî
Xef: Veşartî
Xelex: Şêlû
Xemmas: Fesad

Xemr: Mey
Xer: Ker
Xezra: Kesk
Xired: Eqil
Xirên: Zingîên
Xubrû: Rûxweşik
Xudûk: Perîşan, Xemgîn
Xudûk: Xemgîn
Xurşîd: Roj
Xusan: Pelg
Xusran: Xisaretmend
Xwab: Xew
Xwedawend: Xwedî
Yar: Hebîb
Yed: Dest
Yexsîr: Hêsîr
Zar: Dev
Zeban: Ziman
Zebed: Maddeyeke Bêhnxweş
Zenexdan: Kortika Çeneyê
Zîba: Xweşik, Ciwan
Zûd: Zû